




Derdorê demokratik hevdîtinê dewletê yên bi PKK'ê re nirxand:

## Şer bi diyalogê çareser dibe



### ■ Osman Özçelik:

Di nava dewletê de ji bo hin tiştan hewl dayinek heye. Dewlet çareseriyê di asta herî nizim de difikire. Em vê yekê wekî takîkekê dibînin.

### ■ Eren Keskin:

Divê ev gav tu kesî netirsîne. Lê li Tirkîyeyê kesen ku dibêjin em demokrat in, ditirsin ku vê rûdana dawîn ango kêşeya kurd bînin zimên.

### ■ Faysal Özşift:


Di çapemeniya tirk de ji bêdengiyek heye. Ew naxwazin ku gelê tirk bi meseleyê bihese. Dema pê bihese wê helwesta xwe ya rastîn nîşan bide.

### ■ Aydemir Güler:


Demêñ dawîn di dax-uyaniyê artêşê de guherînek heye. Lê, ji vê yekê, divê mirov derketîna pergaleke demokratîk hêvî neke. (Nûce R.3)

## Serokê Hereketa İslâmî ya Kurdistanê (HÎK) Mele Evdile Dilo:

## Kesê reya xwe bide zilmkaran şirîkê wan e



- Ez dikarim bi rihefî bibêjim ku tu caran ne di partîyan de û ne ji wekî dewlet İslamiyet nehatîye Tirkîyeyê. Ji ber ku li gorî baweriya Hereketa İslâmî ya Kurdistanê eger ku İslâm hatibe Tirkîyeyê, wê iro ne rewşa tîrkan wiha bûya ne ji rewşa gelê kurd.
- Dema ku tu reya xwe bidî kesê zilmkar, tê wê wateyê ku tu dixwazî zilmkar bêñ ser kar. Pêxember gotiye "kî piştgiriya gotineke zalimekî bike, bila zanibe ku zâlim e. Roja qiyametê ew ji rehma Xwedê bêpar e." (Hevpeyvin R.8-9)



SAMİ TAN

Gelên xwedî dewlet ji nav tûrikê dîroka hevpar tiştên têkildarî xwe derxistine û dîrokeke neteweyî anîne pê. Ji gelê kurd re di tûrik de tiştek nemaye.

Zanyar kî ye? Her tişte ku zanyar dibêje, zanistî ye? Rojhilatnas çiqas zanyar in? Mirov dikare cavân zanyaran li mîsyonera binêre? Pişti pirsên li jor, mirov dikare çend pirsên din jî rîz bike. Kurd kî ne? Ji ku hatine? Şaristaniya kurdan di kîjan astê de bûye? Binyata zimanê wan, çanda wan ci ye û hwd. Bersiva pirsên pêşin û yêna paşin têkildarî hev in.

Dîroka pêkhatina neteweyan û dîrok û nasnava neteweyî ne zêde dûr e. Gelên herêmê digel hev jiyane û dîroka wan ketiye nava hev. Pişti derketina netewe-dewletan gelên xwedî dewlet rabûne ji nav tûrikê dîroka hevpar tiştên têkildarî xwe derxistine, tiştên kêm lê zêde kirine û dîrokeke neteweyî anîne pê. Di vî warî de Rojhilata Navîn mînakeke berbiçav e. Li vê herêmê ji gelên bindest re, nemaze ji ji gelê kurd re ku li herêmê mezintirîn gelê bindest e di tûrik de tiştek nemaye. Tişte ku maye ji kesî lê nekolâ-

ye. Lékolîna şaristanî û dîroka gelên bindest ên Rojhilata Navîn maye ji gerok, rojhilatnas û mîsyonera re.

Rast e, van kesan xizmeteke baş ji zanistî re kiriye. Di warê ronîkirina dîrok û şaristaniya gelê kurd de alîkariya wan çebûye. Lê kesen navborî bi çavân kevnetiştîn di muzexaneyan de li şaristaniya û dîroka gelê me nihertiye. Ji ber bîr û ramanê xwe yên olî û siyasi bi pêşdarazî teveriyane.

Gelê kurd ji vê yekê xesareke mezin dîtiye. Ev helwest bûye sedem ku gelê kurd wekî rîbir û hov bê binavkîrin. Şaristaniya gelê kurd bibe malê xelkê. Vê yekê bandora xwe li zanyarîn îroyîn jî kiriye û ew jî bi vî çavî li gelê kurd û şaristaniya wî dînihîerin. Zanyarê kurd Mehrdad Izady di nîseke xwe de ku di hejmara 4'an a Kurdish Life de derketiye çend mînakîn bi vî rengî rîz dike. Bo nimûne, bi lékolînen arkeolojîk derketiye holê ku cihê ku lê cara yekemîn ji ceh bîra hatiye çekirin, çandîn hatiye

kirin û ji tirî şerab hatiye çekirin Kurdistân e lê zanyarîn ewrûpî gelên din wekî dozînerê van tiştan nîşan didin.

Ev helwest jî pêşdaraziya zanyarîn nîşanî mirov dide. Li vir Teza 10'an a Marks tê bîra mirov. Marks wiha dibêje: "Pêdiviya perwerdekaran jî bi perwerdeye heye." Diyar e ku pêdiviya van zanyarîn navborî jî bi perwerdehiyeke zanistî heye.

Her zanyar xwedîyê bîr û baweriyeke ye. Kes nabêje bila zanyar dev ji bîr û baweriye xwe berde. Tişte ku tê xwestin ev e ku ew bîr û raman li ber lékolînen wî/wê nebin asteng, bandorê li xebata wî/wê nekin. Zanyar xwedîyê ci bîr û ramanê dibe ew zane, lê divê rîbaza ku ew di dema xebatê de bi kar tîne zanistî be. Di dema lékolîn û ceribandinê de divê bîr û baweriye xwe deye aliye. Ev yek ji her zanyarî tê xwestin, lê bi taybetî zanyarîn ku li ser mijarê civakî xebatê dîkin çiqas dikarin vê daxwazê bi cih bînin. Ew jî pirseke din e.

## Ferhengok

**barkane:** embar, kewar

**binhisîn:** bilinçaltı

**bermak:** berxa tam ji maka xwe veqetiyaye

**berze:** winda

**bingeh:** hîm, temel

**cerdevan:** korucu

**dagîker:** vegirtok (isgalci)

**debengî:** ehmeqî

**dêmanî:** yerlesik

**dêrîn:** qedim,

kevnare

**gufteguft:** goteget (söylenti)

**hêwirze:** büyük

gürültü

**gûzan:** jilet, ustûra;

tûj

**kelepor:** mîrate

**kereste:** malzeme

**kitîkrin:** gezkirin

**meterîs:** dafik

**mist:** kef (avuç)

**mêjînûs:** dîroknîvîs

**modilkirin:**

**navborî:** sözkonusu

**nîhiçandin:** (dûrtmek)

**nayab:** xweşik

**netewe-dewlet:**

ulus devlet

**nîjâperest:**

regezperest: (ikçi)

**raçandin:** honadin

**qikkirin:** tê firandin (fırlatmak)

**raperîn:** serîhîldan

**rêxistin:** örgüt

**stargeh:** sığınak

**serhevde:** rûreşî, bela

**şaristânî:** medeniyet

**san:** bi şan: parel

**sikart:** berx û miha

ku şivan dawiyê

karê xwe ji nav kerî

hildibijere.

**terabûn:** deverû

ketin (yüzükoyun

düşmek)

**tewangbarî:** büküm

**têgîn:** mefhûm,

kavram

**tertele:** komkuji,

qirkirin

**quncirandin:** çim-

ciklemek

**tolhîldan:** intîkam

**wate:** mane

**werîn:** qîrîn

**zana:** zanyar

**zimanvanî:** ziman-

### ETYEN MAHÇUPYAN

Pîşti ku dewlet bû navendeke bîrdozî ya rakêşîner, "rewşebîr" bû taybetiyeke çîna navîn. Ev yekrengî naşnava takekesi ji holê radike û wê "rewşenbîrê dewletê" yênu ku heman ziman û ferhengê bi kar tînin û wekî cêwîyan dişibin hev derxist holê. İro di rojeva vê lobîya xweser de du kîşeyen bingehîn hene. Daxwazên kurdan û İslamiyan.

Daxwazên kurdan xwedî serboreyeke dûvedirej a balkêş e: Serhildanênu ku 200 sal berî niha dest pê kirine, bi domana demê re rengekî neteweperwerî girtibe ji, xwe bi zimanekî oly daye der. Salênu ku ber bi danîna komarê diçûn, di bin sîwana İslâmî ya rakêşîner de hem di têkbirina Rojavayîyan de hem ji di jîholêrakirina komên ne misilman de kurd kişandin bal Komara Tîrk. Lî ev hevalbendiya ku ji hêla dewletê ve wekî xwespertina kurdan dihate nîrxandin, ji hêla kurdan ve wekî domana danîna hîmî banekî hevpar ê ku di diwaroje de avakirin, dihat fîmkirin. Lewre ji di navbera salênu 1923 û 1940'î de bi qasî bîst raperînê kurdan pêk hatin. Heke mirov bi şêweyekî din bibêje, heq an neheq bermahiyê daxwazênu ku bicihnehatine di binhişîna civakî ya kurdan de cih girt. Heta roja iro bi awayekî jîxweber gelek kurdan di dilê xwe de pişäftina civakî pejirand; gelek di nava pêvajo-

yeke geşkirina wan hestên bermayı re derbas bûn.

Tevî ku li kîşeyeye wisa tevlihev û dijwar heye ji, rewşenbîrê dewletê bi destan nîzîktêdayîneke neteweperrestiya fermî ya digihêje asta debengiyê û dibêje "kurd nîn in" girt. Pêre pêre ramân "kurd hene, lê di navbera wan û tîrkan de tu ferq nîn e" derket holê. Wekî dîflîla vê yekê ji hate gotin ku kurd dikarin bibin serokwezir, bi kur-

tiye honandin. Li gorî vê anketê kur xwe wekî kurd nabînin. Kurdên ku vê lépirsinê dirastînîn bêguman hene; la di vê rewşî de ne lépirsinê navbor dikarin bîr û baweriyan kurdan bipîvîne ji Stenbol dikare Rojhilat binimîne Anketa duyemin ji dixwaze biselmîne ku bi navê kurdî zimanek tune. Bo nimûne, li gorî lépirsinê kirdki ne zarveyekî kurdî ye, kurmancî dibe pêncar, dema ku cudahiyêne herêmî ji zêde bibin hema bêje tu kurd, yekî/e din tiştekî fêm nakek Nîzîktêdayîneke serhevde ya bi vî rengî ançax bi rûpûşek zanyarı tê pêşkêşkirin, lewre wan ji wisa kiriye. Mirovên kînikarin bi civaka xwe re bîyîvin, gelşen civakî çareser bi kin, pala xwe didine saziyên kîmirîn, mirov ji ewlebûna wan gumanbar e. Ü di dawiyê de hewl di din ku civakeke ku ji axaftîn aciz e biafirînin. Her wiha ger kurd xwedî ewqas gelş û tengasiyan be çîma ewqasî me eleqeder dike? Bile kurd serê xwe bi vê yekê re bişînîn. Eger ji hev fam nekin jîxwe nikarin vi zimanî bi kar bînin. Lî eger ji hev fam bikin?

Em gir û rîka ronakbînên dewletîya li dijî demokrasîyê fêm dîkin, lewre demokrasî xwe dispêre wareki ku bîr û baweriyan cuda di xwe de dihe-wîne, lê heman war rûyê rastîn ê van "ronakbîran" eşkere dike.

Têbinî: Ev nîvîs ji hejmara Radikalê ya 13.1.1999'an hatiye wergirtin.

## Pêşdarazî, zanyar û kurd

kirin û ji tirî şerab hatiye çekirin Kurdistân e lê zanyarîn ewrûpî gelên din wekî dozînerê van tiştan nîşan didin.

Ev helwest jî pêşdaraziya zanyarîn nîşanî mirov dide. Li vir Teza 10'an a Marks tê bîra mirov. Marks wiha dibêje: "Pêdiviya perwerdekaran jî bi perwerdeye heye." Diyar e ku pêdiviya van zanyarîn navborî jî bi perwerdehiyeke zanistî heye.

Her zanyar xwedîyê bîr û baweriyeke ye. Kes nabêje bila zanyar dev ji bîr û baweriye xwe berde. Tişte ku tê xwestin ev e ku ew bîr û raman li ber lékolînen wî/wê nebin asteng, bandorê li xebata wî/wê nekin. Zanyar xwedîyê ci bîr û ramanê dibe ew zane, lê divê rîbaza ku ew di dema xebatê de bi kar tîne zanistî be. Di dema lékolîn û ceribandinê de divê bîr û baweriye xwe deye aliye. Ev yek ji her zanyarî tê xwestin, lê bi taybetî zanyarîn ku li ser mijarê civakî xebatê dîkin çiqas dikarin vê daxwazê bi cih bînin. Ew jî pirseke din e.

## Li ba rewşenbîrê dewletê kîşeya kurdî

yeke geşkirina wan hestên bermayı re derbas bûn.

Tevî ku li kîşeyeye wisa tevlihev û dijwar heye ji, rewşenbîrê dewletê bi destan nîzîktêdayîneke neteweperrestiya fermî ya digihêje asta debengiyê û dibêje "kurd nîn in" girt. Pêre pêre ramân "kurd hene, lê di navbera wan û tîrkan de tu ferq nîn e" derket holê. Wekî dîflîla vê yekê ji hate gotin ku kurd dikarin bibin serokwezir, bi kur-

dî stranan bibêjin û bi kurdî nameyan binivîsin. Yanê kurd bi tenê dikaribûn di jiyana xwe ya taybet de bibin kurd. Ji ber ku li ba rewşenbîrê dewletê di qada fermî de cihê xweser nîn bû, li wê qadê ji kurdan re cih nedîma. Piştre hate gotin ku tîrkitî nasnaveke rajo-rin e ku kurdan ji di nava xwe de dihe-wîne, lê vê ramanê cihê xwe negirt, ji ber ku dewletê dev ji helwesta xwe ya ku tîrkitî wekî nasnava rajêrin bi kar dianî, bernedîda.

Niha ji du argûmanên bingehîn ên pûç hene. Argûmana yekemîn li ser anketê ku li Stenbolê hatine kirin, ha-

# Derdorê demokratîk hevdîtinê PKK'ê û dewletê nirxand:


# Şer bi diyalogê çareser dibe

**Eren Keskin:** Dema ku kurd di nav meclîsê de cihê xwe bigirin dê problema artêşê hêdî hêdî ji holê rabe. Lê divê kurd kadroyêna baş bînîn ser kar. Divê ew kes bikaribin ji devletê hinek tiştan bixwazin. Wekî dawî divê herkes berpirsiya xwe bi cih bîne. Ji bilî canê me tiştekî me yî din nemaye ku em bidin. Hinekan ji bo aştiyê berî me canê xwe da, bo rêzgirtina wan kesan, divê em herdem daxwaza wan bînîn zimên.

**R**oja 4'ê rîbendanê, di televîzyona MED de diyaloga di navbera PKK'ê û dewleta tirk de ji alyê rîveberên PKK'ê ve bi belgeyan hatibû ragiandin. Pişti ku raya giştî derbarê naveroka diyalogan de hate a-gahdarkirin, me jî xwe gihande Seroka Saxa İHD'ê ya Stenbolê Eren Keskin, Cigirê Serokê Giştê yê HADEP'ê Osman Özçelik, endamê MYK'ya KESK'ê Faysal Özçift û Serokê Giştî yê SIP'ê Aydemir Güler. Wan bi riya rojnameya me dîtin û ramanêna xwe yên der barê kêseya kurd û berpirsiya dijber û demokratîk de anîn zimên. Der barê vê mijara girîng de me xwe gihande Refîk Karakoç û Levent Tüzel jî, lê mixabin wan bersivêna pirsên me neşandin. Em dîtin û ramanêna kesen ku bersiv dan rasterast pêşkêşî xwendevanêna xwe dikin.

**Seroka Şubeya İHD'ê ya Stenbolê Eren Keskin:**

Li her cihê dinyayê alyênu ku şer dikin bi hev re rûniştine. Divê mirov li dîyalogîn dawîn ên ku di navbera PKK'ê û dewletê de pêk hatine wisa mîze bîke. Divê ev gav tu kesî netirsîne. Lî li Tirkiyeyê kesen ku dibêjin em demokratîn, ditîrsin ku vê rûdana dawîn aango kêseya kurd bînîn zimên. Her tişt jî ji vir dest pê dike. Em nikarin çarçoveya demokratbûnê li gor sînorêna bîrdoza



Agirbestê berî niha ji ber provakasyonê dewletê bi dawî hatin. Agirbesta dawîn jî bi heman aqûbetê re rû bi rû ye. Gelê kurd di her cihî de daxwaza xwe ya bo çareseriya bi riya diyalogê anî zimên, ji bo vê yekê çi ket ser wî pêk anî. Lî dewlet li aliyeqî qasidan dişîne ser PKK'ê, li aliye din jî şer gurtir dike. Derdorê demokratîk li ser jidilbûna rayedarêna dewletê gumana xwe tînîn zimên û wekî çare jî têkoşîna hêzên demokratîk a girseyî dibînîn.

fermî daynin.

Eger muxalefeta demokratîk bi awa-yekî biryâdar tevbîgire û bibêje; divê alyênu ku şer dikin li hev rûnîn, dê ew diyalog jî veşarî nemîn. Rastiyek heye, carinan gotin û rûdanêna li herêmê li hev nakin. Wekî mînak, dema gotinêna tûj têna kirin li herêmê nermbûnek xwe dide der. An jî em bi hêsanî dikarin herin bi hêzên fermî yên herêmê re hevdîtinan pêk bînîn. A herî girîng di rewşen wisa de divê hinek tişt ji tîrkan re jî bêne gotin. Ji ber ku her tişt ji alyê rîveberan ve tê veşartın. Naxwazin ku gel di rastiyê bigihêje. Qaso meclîseke wan heye lê nedîyar e ku ji alyê kî ve tê birêvebirin. Heta ku kontrgerîla neyê têkbirin bi hêsanî tişt pêk nayê. Du tişt hene, ya dewleta tirk di encama operasyona "paqîjiyê" de Haluk Kircî û yên wekî wî digire an jî, ji bo ku wan meşrû bike, wekî wan ê din serbest berde, digire. Wekî we jî got ez jî û gelekkesen din jî pirsa operasyona "paqîjiyê" ji xwe dikin. Divê mirov hemû pirsgirêkî li artêşê jî bar neke. Sivilan iro bi awayekî başebaş sîvîliya xwe bi cih neaniye. Di vir de hilbijartin gelekkirîng e.

Dema ku kurd di nav meclîsê de cihê xwe bigirin dê problema artêşê hêdî hêdî ji holê rabe. Lî divê kurd kadroyêna baş bînîn ser kar. Divê ew kes bikaribin ji dewletê hinek tiştan bixwazin. Wekî dawî divê herkes berpirsiya

xwe bi cih bîne. Ji bilî canê me tiştekî me yî din nemaye ku em bidin. Hinekan ji bo aştiyê berî me canê xwe da, bo rêzgirtina wan kesan, divê em herdem daxwaza wan bînîn zimên.

**Cîgirê Serokê Giştê yê HADEP'ê Osman Özçelik:**

Em hikûmetê wekî iradeyeke siyasi nabînîn. Pêwîstî bi guherînê heye. Dewlet bêqeyide tevdigere. Diyar e ku di nava dewletê ji bo hinek tiştan hewl-dayinek heye. Dewlet çareseriye di asta herî nizim aango kêm de difikire. Em vê yekê wekî taktîkekê dibînîn. Halê hazîr em ne bawer in ku ew ji bo çareseriye amade ne. Jixwe işareteke wisa jî nîn e. Li Tirkiyeyê yên ku herî zêde dibêjin em demokrat in jî ketine rewşenke wisa ku nikarin li derveyî daxwazîn dewletê tevbîgerin. Dema ku ji nav refîn dewletê sînyalek bê dayîn, dê raya giştî çar carê ku em lê difikirin li ser kêşeyê raweste. Diyalogên dawîn jî bi van yekan ve girêdayî ne.

**Serokê Giştî yê SIP'ê Aydemir Güler:**

Beriya her tiştî televîzyona MED, dewleta tirk ji her alyî ve ditengijîne. Rast e dewleta ku digot ez bi 'terorîst' an re rûnanîm', rûniştîye. Ev li her cihê dinyayê wisa ye. Aliyênu ku şer dikin li hev rûnîn. Belê bi riya navber

karan hinek hevdîtin pêk hatine. Ev yek nîşana ceribandinê ye. Pişti vê ceribandinê diyar e ku dewleta tirk êdî qebûl dike ku hêza li hemberî wê hêzeke siyasî ye. Niha jî li riyen danîna diyalogê digerin. Divê ev hêza siyasi wekî muhatab bê girtin. Ev diyalog dê heta ku herin? Ya rastîn ez peyamên dewletê yên ku bi awayekî veşarî şandine zêde jidil nabînîm. Çima? Ji ber ku dewlet dixwaze tevgera kurd bi riya şîdetê an jî bi riya diplomasîyê bêbandor bixe. Ji ber vê yekê bo pêşerojê hinek sînyalîn erêni jî dide. Dibe ku bala we kişandibe, di van demen dawîn de di daxuyanîyê artêşê de guherînê pêk hatiye. Lî, ji vê tabloyê divê mirov derketina pergaleke demokratîk hêvî neke. Heke tevgera kurd karibe hêzên muxalîf li dor xwe bicivîne, hingê em dikarin lîskîn desthilatdaran têk bibin.

**Endamê MYK'ya KESK'ê Faysal Özçift:**

Bêguman xwediyê kêşeyê gelê kurd û muxalefeta demokratîk e. Heke em wekî hêzeke muxalîf bikaribin berpirsiya xwe bi cih bînîn, emê wê hingê bikaribin rî li ber tiştan vekin. Diyalogên dawîn jî hinek tiştan zelaltır dikin. Agirbestê salên 1993 û 95'an bi provakasyonan bi dawî bûn. Em iro li agirbesta 98'an mîze dikin, tê xwestin ku ev agirbest jî bi provakasyon û komplolan têk biçe. Hê jî ciwanîn kurd û tirk jîyana xwe ji dest didin. Ev bi salan e ku gelê kurd aştiyê dixwaze lê desthilatdaran bi şer bersiv daye daxwaza gelê kurd. Heta niha li gelek cihê cihanê kêşeyen neteweyî bi awayekî hatine çareserkirin. Li Viyetnamê, Angolayê û Mozambikê, neteweyan mafî xwe yê çarenûsî bi dest xistiye. Hevdîtinan Îsraîl û Filistînê gihiştine qonakek. Bi salan bo Arafat terorîst hate gotin. Lî iro Arafat bi serokdewleten cihanê re radibe û rûdinê. Dîsa li Kolombiyâ dewlet bi gerîlayan re bo aştiyê hevdîtinan pêk tîne û li ser maseyê rûdine. Hevdîtinan di navbera û İrlanda û Ingilîstanê de didomin.

Di vî warî de berpirsiyeke mezin dikeve ser milê kedkar. Bi awayekî tund divê dengen aştiyane bilind bikin. Ji bo aştiyê têkoşîn pêwîst e. Wekî dawî, di çapemeniya tirk de jî wekî carêna din bêdengiyek heye. Ew naxwazin ku gelê tirk bi meseleyê bihece. Dema ku gelê tirk bi diyaloga di navbera dewlet û PKK'ê de bihece wê helwesta xwe ya rastîn nîşan bide.

# Di psîkololojiya gelên bindest de ziman

Berî her tişî çend pirsên ku di jiyanâ gel û mirovan de geleki giring in divê bêne bersivandin. Ev pirs ci ne?

Ziman ci ye? Têkiliya zimên û mirovahiyê li ser ci bingehê ye? Gelên bindest bi ci awayî li zimên dinêrin? Mirov dikare van pirsan zêdetir bike. Gelek pirtûk, nivîs, gotar û hwd. li ser zimên hatine nivîsandin. Her kes zimên li gorî fîkr û ramanen xwe, li gorî berjewendiyen cîna xwe (belki ne bi awayekî eşkere lê bi awayekî sergirtî) dinirxine û analîz dike.

Mirov bersiva van pirsan nikare bi awayekî hêsan bide. Ji ber ku têkiliya zimên bi her tişte ku di jiyanâ mirovan de eih digire re, heye. Her wekî têzanîn ziman û mirov bi hev re derketine holê. Her wiha pêşketinêni di jiyanâ mirovan de û di zanistê de zimên bi pêş dixin û hem jî ziman di pêşketina wan de bi roleke girîng radibe. Bi zenginbûn û berfirehbûna jiyanê re ziman jî zengin û berfireh dibe, bi pêş dikeve û diperise. Piştî Şoreşa Pişesaziyê (sanyî) ya ku li Îngilîstanê pêk tê û Şoreşa Franseyê ya Birjuwa (1789), li ser rûye cîhanê dewletên neteweyî derdikevin holê.

Ziman hêmaneke bingehîn a van netewe-dewletan e. Her wiha di destpêk



Gelo gelên bindest ji ber ku qedexe ye bi zimanê xwe naaneyivin an ew naxwazin? Pedagog Paulo Freire li zimên fîkrîn xwe wiha bi lêv dike: "Kesayetiya bindest êrîşan dibe ser zimanê zikmakî. Ji ber ku girêdana wî ya bi gel, dîrok û çandê re ziman e. Dixwaze bi bayê bezê ji zimanê xwe bi dûr bikeve. Bi baweriya Freire divê perwerdehiyeke hevpar bê afirandin.

û pêşveçûna şoreşa birjuwa de girîngiya zimên û wêjeyê ji aliyê her kesi ve tê pejirandin. Piştî ku çinêni modern derdikevin holê pêşketina kapitalizmê lez digire. İro ew pêvajo jî bihuriye û sistem derbasî heyama kolonyalîzm û împerialîzm bûye. Împerialîzm ji bo ku nakokiyêni dinava xwe de kêm bike têgîneke bi navê Sîstema Nû ya Cîhanê afirandiye. Bi vê hewldana împerialîzm, dewlet, welat û mirovân bindest dikevin bin êrîşen piralî û mezin. Ev êrîş ne tenê li ser erdê welatan, bi taybetî li ser kesayeti û çanda wan berbiçav dibe. Kesayetiya ku împerialîzm dixwaze, mirov dikare iro li her welati bibîne. Ev êrîş hêdî hêdî dibe şewaza jiyanâ wan û nézîktedaya wan a der barê zimên, çand û dîrokê de.

Gelo gelên bindest ji ber ku qedexe ye bi zimanê xwe naaneyivin an ew naxwazin bipeyivin?...

Mirov dikare vê pirsê ji xwe bipirse û bersiva wê bide. Wê xuya bibe ku demeke dirêj têkoşinêni dijwar ji bo zimên têne dayîn lê bi dû wê re nifşek du nifş derbas dibe êdî kesayetiyeke nû tê afirandin. Rewş guncan be jî tu kes nema bi zimanê xwe dipeyive her kes xwe bi zimanê serdest û mîtingeran ifade dike. Ü bivê nevê zimanê serdestan bi pêş dikeve û zimanê gelên bindest taybetiyen xwe winda dike. Wekî mînak, dîbin helbestvan, edebiyatvan û eserên xwe bi zimanê serdestan diêşinin. Yaşar Kemal, Albert Camus, Ahmet Arif, Cemal Süreya, Selim Berakat ji wan çend mînak in. Ev aliyekî dagirkerryê

ye.

Lê li aliyê din mirovân ku ji bo zimanê xwe li ber xwe dane jî hene. Gandhî, Fanon, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Cengiz Aytmatov û Mgrdiç Magrosyan û hwd.

İro dema mirov lê dinêre, mirovân ku dikevin beşa yekemîn zêdetir in.

Ev kûrbûna psîkolojiya gelên bindest baş nîşan dide.

Her çiqas Gandhî ji aliyê gelek derdoran ve neyê ecibandin jî, ji bo zimanê xwe gund bi gund geriyaye û gelê hîndî hînî zimanê wî kirîye. Ev bûyereke gelekî balkêş e. Albert Memnî ku mirov dikare bibêje di warê psîkolojiyê de xebatên gelek hêja kirine, li ser têkiliya şoreşê ya bi zimên re wiha

dibêje: "Dagirkerrya nûjen di hevokê rojane yên mirovân bindest de vesâye. Ev bandora zimanê serdestan e. Ge ev bê dîtin û jî holê rabe, ev yek bi ser xwe şoreşek e." Ev yek ji bo gelê İsrailî têkoşîna hebûn an jî tunebûnê bi Dîtina Musa Anter a der barê İsrailîya de balkêş e: "Li ser êrdima cîhanê ti gel bi qasî İsrailîyan penaber û perişan nebûye (Ji xeynî kurdan). Lî gencîneye keye wan hebû. Ew gencîneya wan zimanê İbranî yê di hundirê Tewratê û bû." Bo nimûne, Elyêzer bin Yehûda zimanê İbranî yê jîbîrbûyî saz kir û vejand.

Pedagog Paulo Freire li ser zimê fîkrîn xwe wiha bi lêv dike: "Kesayetiya bindest êrîşan dibe ser zimanê zikmakî. Ji ber ku girêdana wî ya bi gel, dîrok û çandê re ziman e, dixwaze bi bayê bezê ji zimanê xwe dûrbikeve. Lî gorî Freire divê perwerdehiyeke hevpar bê afirandin. Perwerdehiya serdestan ku li ser esasê dan û standina mamosteşagirt, dewlet û gel hatiya danîn, gerel jî holê rabe. Heger hêzek bixwaze li di jî dagirkaran ser bike gava yekem ewa ku tesîra perwerdehiya dagirkaran ji se xwe biavêye.

Di vî warî de têkoşîna gelê Kosovayê nimûneyeke gelekî seyr û ecêb e. Gelê Kosovayê tenê ji bo ku bi zimanê xwe perwerdehiye pêk bîne, di binêerdê de dibistan û zanîngêhîn vesari vekirine. Ev têgîhiştina girîngiya zimanê zikmakî û zanebûna neteweyî ye

Ev rewş li Kurdistanê bi awayekî din xwe dide der. Li Kurdistanê kesayetiya binketî ewqas serdest e ku tu devîji mirovî ji rêzê berde mirovân ku xwe wekî rewşenbîrên! kurd bi nav dîkin jî bi kurdî naaneyivin. Car caran kesû derdorênu ku dibêjin şoresh wê bi ziman, çand û hunerê pêk bê jî di nav malbata xwe de bi malîyên xwe re bi kurdî naaneyivin.

Civaknas İsmail Beşikçi der barê zimanê kurdî de rexneyê tund li Tevgera Azadiye digire. Li gorî Beşikçi Tevgera Azadiye di netewbûna gelê kurd de pêngaveke mezîn pêk anîye, lê di warê zimanê kurdî de qels maye û giyîngîya ku pêwist nedaye kurdî.

Her çiqas iro di saziyên kurdan de xebat li ser kurdî bêne kirin jî mirovân kare bibêje ziman, çand û humera kurdîne di asta pêşketina Tevgera Azadiye de ye.

# Di berhemên zimanzanen de zimanê kurdî

**V**on Hammer mêtûnûsê Nemseyî yê bi navûdeng di sala 1814' an de li ser zimanê kurdî û zaravayê wî niviseke ku ji aliyê mêtûnûsê ve nirxeke wê ya mezin heye, nevîsiye.

Fredrick Muellerê Nemsayî sê berhem der barê zimanê kurdî de pêşkêş kirine. Yek ji wan ferhengoka kurdî û suryanî ye. Ya din li ser zaravayê zazayî ye û berhema dawîn jî li ser kurmanciya Bakur e. Berhemâ yekemîn di sala 1863'yan de û ya dumîn di sala 1864' an de û ya sêyemîn jî di sala 1894' an de hatiye çapkirin. Her sê berhem jî li Viyanayê derketine.

Profesor Ferdinand Justi di sala 1873'yan de li ser hinek dengen zimanê kurdî gotareke ku ji 29 rûpelan pêk dihat nivîsandiye. Her wiha wî zanyarî di sala 1880'yi de li ser rîzimanê kurdî namilke-ye kurdî nivîsandiye û li bajarê Petersburgê daye ber çapê. Hoettum-Schinla li ser gençîneya peyvîn kurdî encamên lêkolînên xwe di du cîldan de weşandiye. Vî zana-yî peyvîn devoka mukrî berhev kirine û hinek rîz û rîçikîn zimanê kurdî ronitir kirine.

Oskar Mannê ku ji sala 1901'ê heta 1903'yan, disa ji sala 1906' an ta 1907' an ji bo lêkolînên zimanzaniye çûye Kurdistanê û welatê farisan û hinek welatên din, pişî vegera xwe bi rîzek nivîsîn bi navê "lêkolîna kurdî û farisi" hewl daye ku li zaravayê zaza, mukrî, lorî, kirmansanî, kelhûrî û kurmanciya rojhîlat bikole. Hugo Makas berhemeke gelek hêja li ser devoka yêzidiyan pêşkêşî xwînerên zimanê almanî kirine. Makas ev berhema xwe di

sala 1900'î de li bajarê Heidelberg çap ki-riye.

Kal Hadank ê dostê nêzîk ê mêtûnûs û têkoşerê kurdî gorbihûst Huznî Mukriyanî û her wiha hevrîyê Doktor Kamûran Bedirxan ku berhemên xwe li ser zimanê kurdî nivîsîne, li ser zazakî nivîsiye. Her wiha wî gotareke zanistî ya bi hûrbînî li ser devoka Botan û yêzidiyan nivîsiye. Berhemâ duyemîn li ber ronahiya çend testan bi yarmetiya Bedirxan nivîsandiye. Hadank gotareke din jî li ser zaravayê goranî belav kirine. Komeleya Zanistî ya Zanîngeha Göttingenê li Almanyaya Rojava di sala 1939'yan li ber ronahiya kelepora zanistî ya ku ji Profesor F.C Andreas mabûn pirtûkek li ser zimanê Iranî der-xistiye. Ev pirtûk bi serperiştiya Prof. Anther Christensor û hevpîşeyen wî Kaj Barr û W. Henning derketiye. Ev berhema ku ji 386 rûpelan pêk hatiye, li ser zaravayê zimanê kurdî yê Gerûs, Sîne, Kirmansan, Kêlon û Ebdayî hatiye nivîsandin. Pêwîst e her kurdîzan vê berhemê bix-wîne û jê kelk wergire.

Nasîna kurdan û zimanê wan li Rûsîyê yekemîn car vedigere bo salên nîveka duyemîn a sedsala hejdemîn ku Akademîya Zanistî ya Rûsî "Ferhenga rûberî ya hemû ziman û zaravayan" li çapê da. Ev ferheng di sala 1787'yan de hatiye belavkirin, di ferhengê de 273 peyvîn 200 zimanî cih digirin ku kurdî jî yek ji wan zimanîn e.

X. Aboviyan di sala 1847'yan de li ser rûpelan rojnameya "Qefqas" ku li Tiflisî derdiçû rîzegotar bi sernavê "Kurd" dane

weşandin. Beşen vê nivîsê yê li ser zimanê bandor li ser bîr û raya zanayê rûs kir. P. Lérx û F. Justi jî vê yekê diselminîn ku zimanê kurdî zimanekî Iranî ye û lêzimê zimanê hînd-evrûpî ye. X. Aboviyan zimanî kurdî weki kirmancî û zazakî dabeş dike û ji zanayê cîhanê dixwaze ku dest bavêjin lêkolînên li ser zimanê kurdî yê şîrîn. Her wiha ew dibêje: "Bi vî awayî mirov dikare sudeke yekcar mezin ji bo ronîkirina gelek meseleyê ademîzade û zimanzanî werbigire."

Di zanayênu ku girîngî dane zimanê kurdî de rojhîlatnasê navdar Peotre Lérx xwedîyê cîhekî taybet û diyar e. Lérx, di warê kurd û Kurdistanê de xwedîyê sê pirtûkên girîng e. Tişte li vir hêjîy dabaşê ye ev e ku Lérx zimanê kurdî li pênc zaravayan dabeş dike: Kirmancî, lorî, kelhûrî, goranî, zaza. Ev zana dibêje: "Hiç sedemek nîn e ji bo min ku ez ji bîr û rayen çespandî yê A. Larim, ku dibêje: 'zimanê kurdî xwedîyê cîhekî serbixwe ye di nav zimanê Iranî de' sîk û gumanê bikim. Zimanî kurdî her çiqas lêzimê zimanê farisi be ji di Kurdistanê de serbixwetîya xwe parastiye û di warê perisîn û pêşveçûnê de tu peywendiyen wî bi zimanê farisi re nîn e."

Di sala 1880'yi de Iranzane bi navûdeng Ferdinand Justi pirtûkeke rîzimanî nivîsandiye. Wî di vê xebatê de kelkeke zêde ji berhemên M. Garzonî, A. Xasko, P. Lérx, A. Jaba wergirtiye. Nêzî kutabûna sedsala dozdehan rojhîlatnas A. Sotsîn der barê rîzimanê kurdî de pirtûkên der-xistiye. Ev pirtûk, bi kelepora xebatên ku wî berê digel Y. Prime bi pişikdarî pêk

anîbûn û çap kiribûn, danîn.

Di sala 1891'ê de S. A. Yegîzarof pirtûkek der barê etnografiya kurdî de belav kirine. Ew zanyar 12 salan li nav kurdan maye. Di pirtûka xwe de digel L. P. Zagûrîtiskî li ser hinek gelemşeyen girîng ên rîzimanê kurdî lêkolîn pêk aniye. Di sala 1932'yan de A. Xaçatoryan pirtûkeke rîzimanê kurdî bi ermenî û kurdî da berçapê. Her wiha di sala 1935'yan de li Erivanê A. Xaçatoryan û Hecî Cindî bo pirtûkxaneyen navendî pirtûkeke rîzimanê kurdî nivîsandiye.


Serokê Beşa Kurdistanî li Leningrad Mamoste Qanatê Kurdo gelek karên berhemên zanistî nivîsîne ku piraniya wan li ser zimanê kurdî ne. Nivîsandina pirtûka rîzimanê kurdî, lêkolîn li ser zimanê guftûgo û zimanê edebî, hevrûkirina zaravayê kurmanciya jorîn û kurmanciya jérîn, ferhenga kurdî û rûsî hinek ji wan xebatan in.

Gorbihûst Kerîm Eyyûbi û jina bi navê I. A. Simîrnova xwedîyê pirtûka "Zaravayê kurdî yê mukrî" ne ku bi şeweyekî zanistî û rast li rîzimanê kurdî kolîne. Kurdê Yekîtiya Sovyetê yê berê Çerkeze Beko (Bakayê) ku li Amojeha Ziman-zanî ya Moskovayê kar dikir xwedîyê yekemîn ferhenga kurdî û rûsî ye. Wî ev berhema xwe li dûv Şoreşa Oktobere çap kirine. Ew ji 14 hezar peyvan pêk hatiye. Navê berhemeke din a zanyarê navborî "Zimanê Kurdê Azerbaycanê" ye.

EZÎZ MÎRADÎ, SIRWE HEJMAR: 145  
TİPGUHEZÎ Û LÊHANÎNA KURMANCÎ:  
SAMÎ BERBANG

## Başûr

NEJDET BULDAN



**A**gahîyen vê dawiyê yê li ser Başûr, tevlîhev in. Ne zelal in. Hêvî û gumanêni mirovî reş dikan. Dilê mirovî dihele.

PDK, bûye nûnera dewleta Türk li Iraqê. Li rexekî hevkariya leşkerî, li aliyê dîtrî li ser sîyaseta navneteweyî jî alîkariya tirkan. Helwesta li dîjî şervanê azadiyê, mîna ya dewleta tirk e. Bi şer, qirêjî û dijminahî; çalakiyê kontrayî, yên veşartî û eşkera. Li bakurê Kurdistanê dewleta tirk bi ci rîbazaş ser dimeşîne, PDK jî mîna cemikê (cêwik) wê ye.

Tirk bi şer bersiva agirbesta PKK'ê didin. PDK jî her wisa. Dewleta tirk çawa welat-parêzan dikuje, digire, PDK jî wisa. Dewleta tirk şerê neteweyî bi "terorîzmê" nav dike. Rayedarê PDK' ê jî her wisa.

Li ser hatina Öcalan a Romayê, tirk dosya û argumanê şer didine rayedarên İtalyayê û dewletên din, PDK jî. Heke PKK di qada navneteweyî de bête şermizarkirin, ci kara hêzeke din a kurd heye? Çendîn xeletiyen

PKK'ê jî hebin, bi qasî hevalbendiya bi dijminan re têr kirin nîn e. Bi tenê dijmi-nahiya dagirkeran û bahra behti a tirkan me dizanî. Niha em hîre (hînî) dijminahiyeke din jî bûn. Ya tirkan dijminahiya dîrokî ye. Em fahm dikan. Lî ya PDK'ê ci ye?

Amerîka û tirk ji bo pêk (li hev) hatina PDK û YNK'ê şertîn ne di berjewendiyen kurdan de danîn pêşîya wan. Ev tiştekî normal e. Türk dijmin in û Amerîka jî harikariya tirkan dike. Lî kurd? Kurd çîma vê dijmani-hayê diparêzin û dipejîrinin? Niha em dizanîn ku wan mercan jî PDK didahînîte ber YNK'ê. Ci kurdâyît ye ew?

Lî mirov dibîne ku mixabin helwesta YNK'ê jî ne zelal e. Civînêji bo Kongreya Neteweyî têr kirin, ew helwesta YNK' ê eşkera bû. Heya demekî em naxwazin li ser helwesta YNK' ê şîroveyan bikin... Lî heke ev helwesta eşkera û zelal nebe, "Mam Celal" jî gunehbar dibe. Em dixwazin "Mam" atî û "Kek" atî bi rastî bin. Ne bi derew û lêband-inê rovîtiyê

Çavên me ronî bin. Li gor agahdarî û weşanê teknîkî, kifş e ku televîzyoneke din a kurdan dikeve nav weşanê navneteweyî. Pêwîst e ez bêjim ku hemû xebat û pêşveçûnê kurdâyît kîfe me ji wan re têr. Ramana kî ye, ez nizanim. Lî hemû cîhan dizane ku, pere yên tirk, Amerîka û îngîlîzan in. An jî bi kîmasî bi harîkariya

wan ev televîzyon tê amadekirin. Rayedarê vê televîzyonê, şewirmendê Demirel e. Şewirmendê MîT'ê ye.

Parêzgerê dewleta tirk e. İlñur Çevik e. Béguman şîrike jî. Çapemeniya tirkan behsa hevaliya Çevik û Nêçirvan Barzanî dikan. Navê televîzyonê "Kurdistan TV" ye. Ew tevnê hatî raçandin, wisa diyar dike ku tenê navê wê yê Kurdistanî be. Raman, armancû viyana wê dê li ser parastina kemalîzmê bin. Yanî dijitiya kurdâyît. Hûn dikarin bipirsin. Gelo tu ji kî derê dizanî? Li gundê me û hemû herêma Behdînanê gotineke bab û bapîran hebû: "Xiyar e, ji tûtkê diyar e"

Dibe ku viyana vê televîzyonê navneteweyî ye, ji ber wê çendê ziman jî gelek bideb û terbiye be. Lî ez ditirsim. Min gelek caran guhdariya radyoyen Başur ên PDK'ê dikir. Bi piranî jî dema di navbera PDK û YNK' ê de şer hebû, min temâşeyî televîzyana PDK' ê jî kirîbû. Wey, wey, wey! Ne televîzyon û radyo bûn mîna şerî di taxan da, axaftinê gelek nexwes bûn. Hêviya min ew e ku weşanê Televîzyona Kurdistan, ne wekî ramanen rayedaren wê bin. Ew jî gelek zor e. Hemû xulam û noker berjewendiyen xwe diparêzin. Wekî ku diha-tine Enquerê, rayedarê tirk daxuyanî didane çapemeniya xwe: "Em dê guhê wan bikêşin."

# Kuştina Ağaoglu ne rasthatinek e

Cewlik di navbera eyaleten Amed, Serhed û Dêrsimê de dimîne û herêmeke stratejik e. Darahêne ya ku 18 km ji Çewlikê dûr e jî, berî Komara Tirk û pişti wê bûye stargeha kesayetiyen ku di Têkoşîna Rizgariya Neteweyî de xwedî rolên girîng. Ev navce wekî pireya di navbera Serhed, Amed û Dêrsimê ye. Pişti ku Tevgera Azadiyê li Darahêne gur û ges bû, girîngiya wê ya dîrokû stratejik zêdetir bû û bi vê re KT'ê bi berfirehî hêzên xwe yên leşkerî li wir bi cih kirin.

Darahêne û Çewlikê ji destpêka Komarê vir de gelek kesayetiyen mezin ên kurd di hembêza xwe de hewandine, lewre jî dewlet gelekî ji wan deran ditirse; dek û dolaban lê digerîne û kurdan bi hev dide kuştinê.

Dewletê li herêma navborî di salên 1970'yi de politikayen bi destê kurdan kurd qirkirinê da destpêkirin, bi riya hêzên faşist ciwanen kurd bi hev dane kuştin. Di nava nijdeyên faşist de wezîfeyen taybet dan neviyên şexsiyeten wekî Feqî Hesen, Yado û Telî. Dewletê, bi destê wan kesan di nava du salan de (1978–80) ji 20'an zêdetir ciwanen kurd ên wekî; parêzer Şakir Elçi, İdris Ekinci, Cahit Elçi, Ahmet Duran û hwd. dan kuştin. Her wiha bi 12'ye rezberê re an heman ciwan derdest kirin avêtin girtîgehan an koçberî metropolan kirin, kar û barêni kirêt bi wan dane kirin, ji civakê qut kirin. Di dawiyê de her yek ji wan bû pêxas û çavşorek.

Îro Mahmut Yıldırımê ku bi navê Yeşil tên nasîn li herêmê serkêsiya kar û barêni kontrayı dike, ev yek ne rasthatinek e. Ev kes ji Bongilan (Solhan)ye û bi Feqî Hesenê ku wekî waliyê Kurdistanê yê yekemîn tê nasîn re ji heman eşîr (Zikte) û ye. Mahmut Yıldırım ji malbateke xizan e û xwedîgiravî ji bo ku malabata xwe ji xizaniyê rizgar bike hîn di zarokatiya xwe de bi karêni kirêt û tarî rabû.

Her wiha Cezayir Baysalê ku di 1977'yi yek ji doçenten Zanîngeha Erzomê Orhan Yavuz qetil kir jî, neviyê Yadoyê ku wekî rîbir tê nasîn û Telî (di nava kurdan de navdar e) ye. Ev yek bi serê xwe naveroka rastin a listikan dide der.

Bi geşbûna Tevgera Azadiyê re ji vî bajarî fermandarêne gerîlayan ên navdar derketine. Lewre jî dewletê li herêmê bergiriyyen taybet girtine û bere xwe daye hedefen bêçek û destvala.

Di sérî de endamên Komîteya Navendî ya PKK'ê M. Hayri Durmuş,



Ji aliye çepê ve kesê sêyemin Hişyar Ağaoglu ye.

Mehmet Karasungur her wiha Zeki Yıldız, Haydar Karasungur, Zeki Palabıyık, Abdullah Ekinci, Mustafa Ayçiçek, Vahdettin Kitay, İbrahim İncedursun ji derdorêne vê herêmê tevlî refen Têkoşîna Rizgariya Neteweyî bûne û şehîd ketine. Lewre bi vê mînakê jî mirov têdigîheje ku dewlet çima ewqasî ji herêmê ditirse û bi hûr-

gîng radibû, jî ber nasnameya xwe ya siyasî gelek caran beranberî derdestkirin, îşkence û girtinan ma. Lî tu carî ji riya xwe venegeriyaye lewma di nava kurdan de xwedî rîz û hurmet e. Bi pêşketina têkoşîna azadiyê re rista xwe bi cih aniye, bedel mirin be jî li cenazeyen gerîla xwedî derketiye û cenazeyen wan teslimê malbatan

**Dewletê di nava nijdeyên faşist de wezîfeyen taybet dane neviyên şexsiyeten wekî Feqî Hesen, Yado û Telî, bi destê wan kesan di nava du salan de (1978–80) ji 20'an zêdetir ciwanen kurd ên wekî; parêzer Şakir Elçi, İdris Ekinci, Cahit Elçi, Ahmet Duran hwd. dane kuştin. Her wiha bi 12'ye rezberê re an heman ciwan derdest kirin avêtin girtîgehan an koçberî metropolan kirin, kar û barêni kirêt bi wan dane kirin û ji civakê qut kirine.**

bînî li ser radiweste.

Li ser vê bingehê kuştina Hişyar Ağaoglu girîngtir dibe û derdikeve pêş. Ne bûyera ku di berfanbara 1997'an de li Darahêne pêk hat bûyereke ji rîzê bû û ne jî Ağaoglu mirovîji rîzê bû.

Dewletê disa hedefe xwe diyar kiribû. Li Amedê Vedat Aydin ci be, li Çewlikê Hişyar Ağaoglu ew e. Bi riya kurdan kuştina wî jî perdeya dawîn a listikê bû. Ağaogluyê ku di salên 70'yi de di nava tevgera kurd de bi karekî

wan kirine. Her wiha di pêvajoya HEP, DEP û HADEP'ê de bi rengekî aktif cih girtiye, bi hevreyen xwe re li bîranîna İbrahim İncedursun û Feqî Hesenan xwedî derketiye û hetanî roja mirina xwe jî ev karê xwe bê westan û rawestan domandiye.

Dewletê cara duyemîn bi riya kesekî pêxas û psîkopat êrîşî Hişyar Aşaoglu kir û ew qetil kir. Lî teneğîhişt ku wê ji ber kuştina Aşaoglu têkeve tengasiyê. Lewre kujerê navborî tim û tim di mehkemeyan de

ji dewletê dixwest wadênu bi riya qeymeqamê Darahêne kirine, bi cih bîne. Ger daxwazên wî bi cih neyin, dê her tişti eşkere bike. Lewre jî di 31'ê gelawêja 1998'an de li Girtîgeha Çewlikê bi awayekî darvekirî hate dîtin.

Li vir du xalêni berbiçav û girîng derdikevin pêşberî mirov.

Îtîrafkar Mehmet Döryamayê ku bi navê Dr. Welat tê nasîn e bi eslê xwe kurdi kuştina Aşaoglu de serkêsiyê dike. Ayhan Yılmazê ku xwedî kesayetiyeyeke psîkopat e yê ku di kuştina Aşaoglu de wekî destik hatiye bikaranîn jî kurd e û li navenda Darahêne mezin bûye. Hişyar Aşaogluyê ku bûye mexdûrê bûyera navborî ya ku li navenda Darahêne di 26'ê berfanbarê de pêk hat jî, kurd e.

Kesén ku Ayhan Yılmazê ku bi eslê xwe kurd e di 31'ê gelawêja 1997'an de li Girtîgeha Çewlikê xeniqandin jî disa îtîrafkar Mehmet Döryama (Dr. Welat) û îtîrafkar û gardiyanen bi eslê xwe kurd in.

Her tişti eşkere ye. Dewletê qet xwe newestandiye. Kujer bi eslê xwe kurd, yê kuşî kurd... Qatîlên kujer kurd. Kesén ku hatine girtin kurd.

Qeymeqamê Darahêne Nuh Mete Hamurcu û polîsên bi navê Ayhan Aydancı, Türkê Doğaner li derive ne û peywira xwe didomin. Weki bi sedan kesén din.

Rûyê dewletê yê rastin di vir-de eşkerter dike. Kuştina Aşaoglu polîtikaya dewletê ya bi destê kurdan kurd kuştinê zelal û saytîr dike.

ZÜBEYİR ASLAN

□ 22.01.1946:

**Komara Mihabâdê  
hate damezirandin**

Komara Mihabâdê ya Kurdistanê di bin serokatiya Qazî Mihemed de hate damezirandin. Li gorî dîrokzanan ev yekemîn dewleta hemdem a kurdan e. Serokê Komara Mihabâdê Qazî Mihemed ku yanzdeh mehan serokatiya komarê kir, di sala 1947'an de di sêdarê de hate daleqandin û qetilkirin.

**BÜYERINE JI DÎROKÊ**

□ 17.01.1991:

**Hereketa bahoze  
dest pê kir**

Li hemberî dewleta Iraqê Herekata Bahoza Çolê dest pê kir. Ev herekat bi xwe navê Şerê Kendavê ye. Pişî ku dewleta Iraqê Kuveyt dagir kir, hêzên împêriyâlist bi taybetî jî Amerikayê, ji bo parastina dûvîkên xwe, şêxên petro-dolar ajot ser Iraqê û ev şer da destpêkirin.

# Rewşenbirên Kurd diçin Romayê

**P**latforma Rewşenbirên Kurdistanê hefteya borî li bajarê Almanya Kônê civiya û rewşa dawî nirxand. Platforma Rewşenbirên kurd di serê sala 1998'an de hatibû avakirin lê belê bi vê civînê re platforme xwe gihad gelek rewşenbiran. Ji her çar parçeyên Kurdistanê nêzikî 150 rewşenbirên kurd tevlî civînê bûn û bîryar stand ku bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, Serokwezîrê İtalya Massimo D'Alema û Wezîrê Karêne Derve Joschka Fischer re hevdîtinan çêkin.

Di civînê de komîsyonek hate avakirin da ku ji bo piştgiriya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, ji serokwezîrê welatîn biyanî re name were şandin. Her wiha ev komîsyon ji bo ku Mesut Berzani jî tevlî yekitiya neteweyî bibe wê nameyekê jê re bişîne.

Civîn ji aliye helbestvan M. Emin Pencewînî, Nivîskar Selim Ferat, Nivîskar Mustafa Reşîd, Nivîskar-werger Abdullah Uzun û rojnameyan Sabri Agir ve hate rêvebirin. Axaftina vekirin ji aliye helbestvanê ji Başûra Kurdistanê Pencewînî ve hate kirin. Pencewînî di ayaftina xwe de li ser mijara di tevgerên kurdan de rola rewşenbiran sekinî û wisa got; "Rola rewşenbiran di tevgerên kurdan de girîng e. Lê belê di dîroka kurdan de rewşenbiran ev rol neleyist û serokên kurdan bitenê man."

Piştî vê ayaftinê Endamê Konseya Rrêvebir a PKDW'yê Zübeyir Aydar, Nivîskar Mistefa Reşîd, Zimanîz Hüseyin Kartal û Nûnerê PKK'ê Abdurrahman Çadırcı ayaftinek kir.

Dawiya van axatinan beşa giftûgoyê dest pê kir. Di vê beşê de jî, 30 rewşenbirî nêrînê xwe anîn zîmîn. Wan bi giştî bal kişan ser pêwîstîya Kongreya Neteweyî. Rewşenbiran her wiha ramanê xwe yên li ser rewşa dawî jî, anîn zi-mîn.

Ji bo endamtiya rîveberiya Platforma Rewşenbirên Kurdistanê jî hilbijartin pêk hat di hilbijartinê de, Selîm Ferat, Sabri Agir, Günay Aslan, Medenî Ferho, Abdullah Uzun wekî rîveberiya platforme hate hilbijartin. Di dawiya civînê de wekî din ev bîryar hatin standin;

1- Konseyeke saziyên çand, huner û wêje were avakirin.

2- Platforma pêwîst e ji çar mehan carekê bîcive.



3- Civîneke bi vî rengî di navbera mehekê de li Stockholmê were çêkirin.

Civîna Platforma Rewşenbirên Kurdistanê, bi ayaftina nivîskar Rojan Hazim qedîya.

**Dîtinê rewşenbiran**

Piştî civînê rewşenbirên kurd ev daxuyanî dan rojnameya me...


**M. E. Pencewînî (Helbestvan):**

Civîn gihişt armanca xwe. Civîna me bîryar girt ku xebatên rewşenbirî xurt bike. Xaleke din jî, ew e ku rewşenbirî li hemberî leyistikên dijmin bisekinin û li dûv planên dijmin nekevin. Bi kurtayî mirov dikare bibêje ku rewşenbir xwe ji bo pêvajoyê amade dikin.

**Bekir Hesen (Nivîskar):** Pêwîst e rewşenbirên kurd, pêvojaya iro bizanibin. Pêwîst e xwedî helwest bin. Ya herî girîng jî, pêwîst e helwesten wan li hemberî Kongreya Neteweyî hebe. Ji bo nûnertiya gelê kurd, pêwîst e Kongreya Neteweyî were çêkirin. Dijmin dixwaze wekî Kurdistanê rewşenbirên kurdan jî, parce parce bike. Li hemberî van leyistikian rewşenbir pêwîst e dîwarekî çêbikin.

**Necîp Balayî (Helbestvan):** Tayebetiyeke vê civînê hebû ew jî, pêwîst bû moralek bidin rewşenbiran. Ev merheleyeke pir girîng bû. Ji ber ku dijminê me dixwazin nêrînê cu-da bixin nav me. Lî belê nikare bi ser bikeve. Di her demê de xwestiye vê çêbike. Di her tevgerê de rewşenbirên xayîn, rewşenbirên opor-tonîst hene. Û rewşenbir jî, bi şoreşê ve girêdayî ye. Pêwîst e em dilê xwe neêşînî. Di şoreşâ Kurdistanê de jî, her ev hebûye.

PERWER BENGÎ /ALMANYA

**ÇAVDÊRÎ**

## Serok, Dreyfus îmzeavêjêne me

MÎRHEM YİĞİT

**G**ava ku mirov li dîroka penaberî û cîhguhartina siyasi dinere, mirov dibîne ku gelek serok, rewşenbir û pêşengêñ muxalîf, şoşeger ji welatê xwe derketine. Ji parzemînekê derbasî yeke din bûne.

Derketin û şerefeke mîna ya Serok ku ewçendî deng dabe, ewçendî dewlet û siyasetmadarên serdemâ xwe bi xwe mijûl kiribe, wiha bi vê derecê zelzèle rakiribe û di rojeva cîhanê de bûbe xwedî cih, nayê dîtin. Li aliye din bûyereke mîna vê yekê ku gelê kurd ji qurm de hejandibe, bala kurdêñ giş perçeyên welêt rakşabe, ketibe şev û roja hemû mirovên kurd, hê ji diya xwe nebûye. Ev taybetmendîyeke serokayetiya Apo û şoşera neteweyî û Kurdistanî ye. Aliyekî nû û cihêker e. Helbet qonaxek e ji. Pirşîrêka gelê kurd bi xurtiyeke wiha dikeve rojevê ku careke din kes dê nikaribe paşguh bike.

Dijwarî ci bin, çawa bin, êdî zeman ji her car zêdetir dikeve xizmeta kurdan. Dijmin jî dê di cebhê derve de jî roj ji roja din zêdetir serê wî têkeve ber, dê hew karibe xwe biparêze û xwe nikaribe ji navnobûnê rizgar bike. Kuçê neyar li vir jî diqulupe û ci ye û ne çiye dê raya giştî li vir jî pê bihese. Du meh diqedin ku serok li Italyayê ye. Belê ew maflê statuya siyasi ku ewrûpî didin her kesî, hê wan nedaye serok. Ev divê her mirovê kurd û berî her kesî jî xwenda û bîbirîn kurdan bifîkirine. Hatina Serok û prosesa ku bi vê hatinê re dest pê kir hînek tişt zelaltır kirin û hin jî baştir derxistin meydânê.

1- Serokayetiyeke rast û di xizmeta gel û welat de bi dijwariyên mezin re li hemberî hev e. Li hin "Serokê" kurdan binîrin çendî bi hêsanî li Ewrûpa, Amerîka û Rojhilata Navîn digerin. Hin ji wan bi pasaporten sor ên dewleta tirk û bi serbestiyeke bêşînor diçin û tê, ji welatekî dikevin ê din. Çima gelo? Sîrtir in? Layiqtir in? Aliyê wan ê temsîlkariya neteweyî serdestir e? Na! Ji ber ku iradeya wan ne di desten wan de ye, ji berjewendiyînetewaya xwe bêhtir serbiderve ne, li gora fermanê dagirkê rojava dikevin kozik û çeperan, her dever ji wan re vekirî ye.

2-Ewrûpa û Amerîka ferqê dixin nav siyasetmedar û serokên kurdan û ji bo wan, xwedîye du siyaseten cihê ne. Helwest û rezdariya Rojava ji bo serokên kurdan ne li gorî piştgiriya gelê kurd û di vê çarçoweyê de ne girêdayî demokratîkbûn û meşrûtiyeta wan, belê li gorî çendî ji gotina wan dernakevin û li gorî wan radibin û rûdin de, bi laş û gewd dibin.


3-Hatina Serok di meseleya demokrasiyê de û girêdayî mafê mirovan de jî ev cîhana desthilatdar û pêşketî, çilo û çawa ye, çendî ne ciidî û ne durist e ji destnîşan kir.

4-Van du mehan gelek mirov ên ewrûpî jî hişyar kirin û ji wan re bû alîkar da ku bibîne bê ka hiqûqa rojavayî çendî dirû û neînsanî bûye, fesiidiye, çendî dejenere bûye û bi kîjan nisbetê bê bersiv maye.

Tewafuq û lihevkirineke fireh heye ku rewşenbirî girêdayî bûyera Dreyfus û helwesta beramber bêbextiya ku lê bûye, ji diya xwe bûye û nûxuryê wê jî rewşenbirê transî romanivîs Zola ye. Iro Serok Apo jî bi mezintirîn şahdemizawîrî û telaqreşya sedsala me tê tawanbarkirin ku "terorîst" e. Rewşenbirîya rewşenbirên me jî, bi çê û neçeyen xwe çend eyar e, çend derece ye û nirk û buhayê wê çend e, me di van du mehan de bi giş misql û zereyên xwe dît. Di nav sîh û sê îmzeavêjêne me de, pesindarên Zola û alîgirê Dreyfus hene, belê helwesta wan ku rojnameya Huriyetê ji xwe re kir manşet, çendî bi yê Zola re li hev dike û çendî na, pêwîst e hînekî din li ser biponjin.

Serokê Hereketa İslâmî ya Kurdistanê

# Kesê reya xwe bide zilmkarar



**B**irêz Evdile Dilo Hereketa İslâmî ya Kurdistanê kengê û ji bo çi hate avakirin?

• Di serî de, bi navê Yezdanê dilovan û mehrîban ez dest bi axavtînê dikim. Hereketa me ji sala 93'yan vir de wekî Hereketa İslâmî ya Kurdistanê (HİK) kar û xebata xwe dimeşine. HİK du wezîfeyan bi hev re digire ser milen xwe. Yek, em li hemberî binpêkirin û perçiqandina nirkên, (değer) dînê İslâmî disekinin. Lewre iro nirkên dînê İslâmî di bin lingan de mane û tene perçiqandin. Armançâ me ya din jî, hem teşhîkirina wan dewletênu ku bi navê İslâmî nirkên İslâmî binpê dikin e. Hem jî ji bo gelê kurd derxistina rastiya dînê İslâmî ye, da ku gelê kurd ji wan şasî û xwariyên dijmin xilas bibin.

Tevî van tiştîn ku me anîn ser zimîn, hereketa me hereketekê neteweyî ango millî ye. Lewre dînê İslâmî neteweyetiye red nake û dîn û milet ji hev nayîn qetandin. Her çiqas dagirkeran li Kurdistanê milet û dîn ji hev qetandine, siyaset û dîn ji hevûdin dûrxistine û qewm bi navê ümetê ji hev qetandine jî, emî li hemberî vê siyasetê bisokinin û gel zana û agahdar bikin.

**Wekî hûn jî pê dizanîn Partiya Fazîletê (berê Refah bû), li Kurdistanê û Tirkîyeyê xwe wekî berdevk û nûnera dînê İslâmî dide naskirin. Hûn politikaya Fazîletê ya li ser kurdan û dînê İslâmî çawa dibînin?**

• Niha her kes bi tewra imperyalîzmî ya li hemberî dînê İslâmî dizane. Dema mirov li dîrokê dînihêre, hêzîn împerialîst û hevkarê wê kemalîzm jî, ji

Mirovên ku rojiyê digirin, gerek e xwe biguherînin. Lî ev guhartin heta niha cênebûye. Di Meha Remezanê de qirkirin, tecawiz û zilma dewleta tirk li ser kurdan zêdetir bû. Ka li ku ye dengê Fazîletê? Dengê wan tenê di dema hilbijartinan de derdikeye. Ew jî, ji bo ku bikaribin li ser kursiya xwe rûnin e.

bo ku nikarin bi fen û fütan dînê İslâmî ji holê rakin, dest avêtine dek û dolaban. Ji bo vê armanca xwe jî dest bi avakirina partiyê İslâmî kiriye. Ji ber vê yekê divê mirov li ser siyaseta dewleta tirk û kemalîzmî bi taybeti bisikine. Mirov dê baştıf fêm bike ka Refah û Fazîlet çi ye? Partiya Refahê di sala 1980'yi de rabû. Li aliyê din her kes baş pê dizane ka Necmettin Erbakan çiqas mirovekî dîndar û İslâmî ye? Ji ber ku ihtîsasa Erbakan li ser muhendisiya makîneyan e. Yanî ew ji çekirina makîneyan baş fêm dike. Ew çi ji şerîf, qanûnên Xwedê fêm dike? Eleqeya wî jê dûr e. Her wiha herkes baş pê dizane ku dewleta tirk di destûrnameya (anayasa) xwe de her tişti li gorî esasen Mîsak-i Miliyê daniye; her çiqas partî bi nav pir bin, boyax pir bin, lê di bingeha xwe de siyaseta wan yek e. Lewre hemû partî siyaseta xwe li gorî Mîsak-i Miliyê dimeşinîn.

**Gelo sîstema Tirkîyeyê rî dide ku partiyek an jî rîexistineke İslâmî destûra xwe li gorî Qurana Kerîmê deyne?**

• Ez dikarim bi riheti bibêjim ku tu caran ne di partîyan de û ne jî wekî dewlet İslamiyet nehatiye Tirkîyeyê. Ji ber ku li gorî bir û baweriya Hereketa İslamiya Kurdistanê, eger ku İslam hatibe Tirkîyeyê, wî iro ne rewşa tirkan wiha bûya û ne jî rewşa gelê kurd. Vêca li ser vê hîmî, Partiya Erbakan, Refah dema hate ser hikum, bi sedan soz û peyman dane gelê kurd û tirk. Lî Erbakan, ew soz, bi tenê ji bo ku were ser hikum, dabûn. Ji ber vê yekê wexta bû serokwezîr li şûna ku bibe hêviya gel, hêviyên kesenî li derdora wî jî, jê şikestin.

Ya duduyan dibe ku mirovên li pey Erbakan û partiya wî xêrxwazê İslâmî bin. Lî Erbakan bala xwe dayê ku ev talûkeyek e. Ji ber ku hareketekê wekî ya Hereketa İslâmî ya Kurdistanê derket. Eger li Tirkîyeyê ji bo İslâmî ew rîberîyeke rast bike, wê kemalîzm li nav piyan here. Lewma Erbakan ew zengilê talûkeyê ji dewletê re lêxist û got: "Ez êdî bi dilxwaz û alîgîrîn xwe nikarim. Hemû tiştîn min eşkere bûn. Niha hûn dikarin partiya min bigirin." Em wekî Hereketa İslâmî ya Kurdistanê dibêjin; Erbakan partiya xwe bi imzeya xwe daye girtin. Ji ber ku eger nedabe girtin, dibû ku tiştek çêbibûya. Vêca ji bo vê jî

bedel lazim e. Lewre bi zanebûn Fazîlet ava kir.

**Wekî diyar e li bakurê Kurdistanê pêsiya Refah û Fazîletê, Partiya Selametê ya Neteweyî MSP, bi taybeti bi piştgîriya şêx û meleyên kurd li ser piyan maye. Niha bi baweriya we, helwesi dûvajoya MSP'ê, Fazîletê wê di pêşerojê de çi be?**

• Jixwe hîma şêxîtiyê jî ji aliyê osmaniyan ve hate danîn. Ji bo ku bikaribin mirovân bawermend bikin hevalbendê dewletê, şêxîti derxistin holê. Şêx bi xwe alîgîrîn dewletê ne. Bêguman wê şêxan li ser piyan bihêle, ji ber ku şêx her tim nêzîkî dewletê ne. Şêx bin, beg bin bi navê wan hereket dikir. Lewma dewlet bi xwe jî dibêje: "Xusûsiyeta gelê kurd ew e ku bi mezinê xwe ve girêdayî ye. Lewre heta hûn bikaribin pişta mezinê wan bigirin." Mezinê wê demê kî bûn? Şêx bûn, beg bûn, axa bûn. Gel jî bi wan ve girêdayî bû. Ev rast e jî.

Li aliyê din dijmin dixwaze ku menas bike. Divê em jî êdî xwe baş nas bikin. Gelê kurd dîndar e. Heta pir saf e. Bi rast û duristî nêzîkî meseleyê dibe. Ji bo vê yekê, wê dewlet di serî de şêxan têxe hembêza xwe û bi riya wan propaganda Fazîletê bike. Wê bibêjin: "Ev pariya Xwedê ye. Em doza şerîta Xwedê dikin." Gelê kurd yê li balê jî, wê pê bawer bike û reyê xwe dîsa bide qasidê serê xwe.

Navê partîyan ne girîng e. Demekê Selamet an jî Refah e. Niha jî Fazîlet e. Ew ew qas ne muhîm e. Wê niha bibe tiştekî din. Lî ez dibêjim êdî bila gelê kurd bi navan neyê xapandin. Li gorî nêrîna dînê İslâmî em li şikil û li navan nanihîrin. Em li emel û karê wan dinihîrin. Pratîka hemûyan jî li ber çavan e. Ev hadîsa Pêxember e. Ji ber vê yekê kîjan partî dibe bila bibe tu ferq di navbera partîyan li Tirkîyeyê da nîn e. CHP, MHP, Fazîlet û hwd. hemûyan heyâ roja iro gelê me xapandiye û bûne iqfidar. Di exlaqê wan de tunekirina gelê kurd heye, tecawiz heye, fitne û fesadî heye. Ev jî neyartiya dînê İslâmî ye. Ka çawa misilmanî tê meşandin? Ji ber hindî em dibêjin qonaxa ku gelê me gihişîtyê, divê her kes nas bike.

Niha em di Meha Remezanê de ne

• Em nikarin ji wan re bibêjin şêx Ew di nava civaka kurd de kesen mûmtaz û bijarte ne. Jixwe em ji hemû şêxan re nabêjin, ne baş in. Em wekî Hereketa İslâmî ya Kurdistanê li pey rîc û doza Şêx Seîd in. Her wiha em didin ser riya kesenî mîna Seyid Riza û Qadî Muhammed.

**Wekî li we jî diyar e Rêxistina Hizbullahê, bi taybeti ji salên 1990'î vir wî li Kurdistan û Tirkîyeyê bi piştgîriyu dewletê xurt bûye? Hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

• Erê. Wekî min got ev yek bi ser keshîya Amerîka û hevalbendê wê Tirkîyeyê û İsrâîlî dimeş. Çawa ku Amerîkayê Rêxistina Talîbanî li Rojhilat Navîn li hemberî İranê ava kir, dewleta tirk jî bi eynî sîstemî Partiya Refahî derxist holê. Niha jî Fazîletî derdixe. Ji ber ku Rojhilata Navîn ji hêla dînî ve xwedî taybetiyeke cihê ye. Loma divê wan bi perdeyekê girêde. Lewre partîyekî derdixe holê, lê nahêle ku ew zêde pêş bi keve. Binihêre li Tirkîyeyê bi navê Hizbullah yanî Partiya "Xwedê" rîxistîne hate avakirin. Navê wê xweş e lê siyaseta wê ya imperyalîzmî û Partiya Kemalîzmî ye. Ji ber vê yekê ez wekî Serokî Hereketa İslâmî ya Kurdistanê ji gelik kurd re dibêjim; guhêne xwe nedin Fazîlet û yên din. Niha partiya Türkeş ji Refahî duristir e. Çima? Ji ber ku MHP bi awayekî vekirî dibêje: "Ez dijminê gelik kurd im û qanûna Atatürkî diparêzim." Lî Fazîletî kirâsê İslamiyetê li xwe kiriye. Yanî mîna hingiv, bi vî rengî ev partî derxiste holê. Mesela di hilbijartînde, gelê kurd tev dibêje; ez vê MHP'ê naxwazim. Ji ber ku partîyekî nijadperest e, kufr e û kemalîzmî diparêze. Lî dibêjin: "Wê Fazîlet Şerîfatê bîne. Fazîlet navekî xweş e, wê xweşiyê bîne." Ji ber vê yekê ez dibêjim tu ferq di navbera partîyan li Tirkîyeyê da nîn e. CHP, MHP, Fazîlet û hwd. hemûyan heyâ roja iro gelê me xapandiye û bûne iqfidar. Di exlaqê wan de tunekirina gelê kurd heye, tecawiz heye, fitne û fesadî heye. Ev jî neyartiya dînê İslâmî ye. Ka çawa misilmanî tê meşandin? Ji ber hindî em dibêjin qonaxa ku gelê me gihişîtyê, divê her kes nas bike.

**Li aliyê din li Kurdistanê şêxen miña Şêx Seîd jî hene. Hûn wan çawa dibînin?**

# Ele Evdile Dilo: şirîkê wan e

Em ji dewletên ereban re dibêjin: "23 dewletên we û 23 alên we hene. Hûn ji Kurdistanê re alekê dixwazin an na? Hûn dewletekê ji kurdan re dixwazin an na? Di vê meha mubarek a Remezanê de, hûn piçekî bi şerpezeñi û koçberiya gelê kurd hesiyane an na? Ger ku pê nehesiyan bila ji imana xwe bitirsin.



## Jînenîgarî:

Navê min ên rastîn Mele Faîq Dilo ye. Ez ji başûrê Kurdistanê ji navçeya Efrînê me. Min Şerîat qedandiye û geleki miiftîfî û mamosetiya Mederseyâ Şerî kiriye. Ji destpêka vê hereketê ve em endamên wê bûn. Berê me gelekî di nava partiyêne İslâmî de xebat û xizmet kir. Lê pişî demekê me jî berê xwe ji van partiyen bada. Lewre gava me di got; 'em kurd in, em însan in' wan em qebûl nedikirin. Me gelek ked da, lê bi rastî, em bi derketina hereketa xwe re hişyar û zana bûn. Ev tiştîn berê iro nayê xuyakirin. Ez pir kîfxweş im hem ji aliyê dînî û hem jî ji aliyê milî ve di xizmeta gelê xwe de me. Lewre ev di bingeha xwe de yek in. Ji ber vê yekê ez hem li ber Xwedây xwe û hem ji li ber gelê xwe serfiraz û dilşad im.

*Li Kurdistan û Tirkîyeyê dem ber bi hilbijartinê ve diçe. Partiya Fazîletê ji, bi giranî li Kurdistanê ketiye nava hâzırîyeke berfireh, ku reyên kurdan ji xwe re bistîne. Di vir de tewra Hereketa İslâmî ya Kurdistanê wê çi be û li ser vê yekê çi haziriyen we hene?*

• Em wekî Hereketa İslâmî ya Kurdistanê, vê meha mubarek, wekî dema xweguhartin û aştiyê dibînin. Divê her kes di vê mehê de xwe nû bike û bi guherîne. Mirovîn ku rojiyê digirin û yên ku duaya rojiyê qebûl kirine, divê xwe bi guherînin. Lê em dînihîrin ku ev guhartîn heta niha çenebûye. Di Meha Remezanê de qirkirin, tecawiz û zilma dewleta tirk li ser kurdan bêyi rawestan bêhtir berdewam kir. Ewqas qirkirina mirovan, tecawiz û kuştinê bê mehke-me... Ka li ku ye dengê Fazîletê!? Dengê wan tenê di dema hilbijartinan de derdikeye. Ew jî, ji bo ku bikaribin se-hata xwe bînin cih û li ser kursiya xwe rûnin. Niha dîsa ji gelê kurd re dibêjin, werin em dê ji we re wiha bikin! Ma ne

bes e? Wê heta kengê bi dîn me bixapî-nin? Wekî min di serî de jî got, xebata me ji bo eşkerekirina emelê wan yê le-witî, nîfaqa wan û munafîqiya ku li ser navê dînî İslâmî dimeşînin e. Em wekî Hereketa İslâmî ya Kurdistanê dibêjin: Li ser navê Quranê û sineta Pêxember, kî reya xwe bide van partiyen, ci Fazîlet û ci yê din, ew li cem zilmê û li dijî İslâmiyetê reya xwe dide. Ji ber ku li gorî esasen İslâmî, kesen ku reya xwe bide mirovî ku zilm û neheqîyan li kesen mazlûm dikan, ew jî dîbin şirîkê gunehîn wan.

*Yanî hûn dibêjin alîgîrî û terefداری Fazîletê alîgirtina zilmê ye?*

• Bêguman e. Vêca dema ku tu reya xwe bidî kesê zilmkar, maneya wê ew e ku tu dibêjî; bila zilmdarî bête ser hikum. Wê çaxê tu dibêjî; ez qâl im ku kufr were ser hikum. Ji ber wê Pêxember dibêje: "Kî bi gotineke yekî zalim destek bike, bila zanibe ku zalim e. Roja qeyametê ew ji rehma Xwedê bêpar

e."

*Birêz Mele Faîq Dilo dawiyê tiştîkî hûn ji bo gelên ereb bibêjin heye? Ci projeyen HîK'ê ji bo biratiya di navbera her du gelan de hene?*

• Niha projeya me ev e. Li-ser Quranê ye. Em tenê ayetekê dixwînîn, ka emê çawa bi hev re bijîn? Dewletên ereb, faris û heta tirk jî di nav de, em dibêjin werin em banga Xwedê pêk bînin.

1-Xwedê dibêje; "Ya ayu ha nas xe-leq nakum min zekere we unsa weceel nakum şî-ûbe weqxebalî taaraf". Dibêje; "Îne-ekra-mekum îndelahe asxaf" Yanî dibêje: "Me hûn ji yek dayik û bavekî xuliqandine, ji Adem û Hawa. Milet milet, qabîle qabîle, şab şab." Bi awayekî din dibêje; "Herkes bi dewleta xwe, herkes bi hemû şikil û şemala xwe ve, federaliyekê di nava xwe ava bikin û bi hev re bijîn. "Îne ekra-mekum" ïn yanî baştir ew e ku doza qencî û başiyê bi-ke, li cem Xwedê yê herî bas ew e. Ban-

ga me jî ew e em dibêjin werin vê ban-ga Xwedê pêk bînin.

2- Her wiha em dibêjin; biratiya me ya dînî heye dîsa em birayê hev in. Lê em dibêjin, bira ev e. Wekî Pêxember gotiye; "La-yu mîne hedi-kum" yanî ba-weriya wî tuneye, ew kesé ji tiştîn xwe hez bike û ji birayê xwe hez neke. Em ji dewletên ereban re jî dibêjin: "23 dewletên we hene, 23 alên we hene. Hûn ji Kurdistanê re alekê dixwazin an na? Hûn dewletekê ji kurdan re dixwazin an na? Eger hûn naxwazin, bêşik û guman emê li ser gotina Pêxember bibêjin: "Qet imana we nîn e." Mirovîn misil-man birayê hev in. Xwîn, mal û erdê wan hemû ji hev ra heram in. Heger ew vê biratiya Quranê dixwazin, divê destê ji van kirinan berdin.

Banga me ji wan re ev e, em ji bo aş-tiyê hazir in. Eger we em qebûl kirin wê çaxê hûn dikarin bêjin em misilman in. Eger we em qebûl nekirine, tu heqê we tuneye ku hûn behsa İslâmî bikin.

Hx. Pêxember dibêje: "Mumîn wekî laş û cestekî ne. Eger ji wî laşî tiliyek jî bişê hedanî bi wî nakeve." Ez ji dewletên ereban re dibêjim: Di vê meha mu-barek a Remezanê de, hûn piçekî bi şer-pezeñi, koçberî û penaberiya gelê kurd hesiyane an na? Ger ku pê nehesiyan bila ji imana xwe bitirsin. Eger mumîn in, bila xwe di vê êşê de bibînin û destê alîkariyê dirêjî gelê kurd bikin.

*We di axaftina xwe de got, li gorî İslâmî her kes wekî hev xwedî maf e. Ge-lo welatên İslâmî vê yekê çiqas bi cih finin?*

• Rast e. Yek nikare bibêje ev kafir e ev ne kafir e. Mesela rojekê Pêxember (S.A.V) li yekî cihû rast tê. Kesé ku pê re ye dibêje, ev ne misilman e. Hz. Pêxember dibêje: "Xwedê negotiye ereb, cihû û yekî din, xwedî keramet e. Hemû însan wekî hev in." Pêxember dibêje; "A nas û sewasiyetun-ku esnal miştiye" yanî hemû însan mîna wekşekî ne. Wekşek ci ye? Gerek e dewleta kurdan hebe, ala kurdan hebe, hikûmeta kurdan hebe.

Di baweriya min de, dewletên li Rojhilata Navîn tev heta wekheviya wekse pêk neyinin, nimêja wan jî û her tiştî wan jî bêfeyde ye. Hz. Pêxember eşkere û vekirî gotiye: "La ferqa beynil erabiya la acemiya, la ferqa beyna ehmed ele asu bi teqwa" yanî di navbera ereb, ecem, reşik û spiyan de tu ferq nîn e." "İla-teqwa" kîjan qenc û baş be, ew birayê min e.

# Helbesta Dilê Zehrayê me

Helbesta Dilê Zehrayê me  
Ez r̄ewiyê hêviyê me dayika min!  
Carna jê ba me û li her derê me  
Carna jî ez jiyan im li te sér dikim  
Mîna min got ez r̄ewî me dayika  
min!

Rêwiyê jiyana nû me ji bo te  
Ez du gotin im di nava lêvén germ  
de  
Yan jî bayê azadiyê me li ser bejna  
te

Ez r̄ewî me dayika min...  
Sekin nîn e ji bo min  
Minbihist tu li min digerî  
Dûr negere, hêstirê çavê te me  
Wekî min got dayika min ez r̄ewî  
me

Serê xwe bilind bike ez Çewran\* im  
Her dem li ber çavê te me  
Ji bo hevalê xwe ez çiya me  
Û star im stara azadiyê me  
Tim li ser lêvê hevalê xwe me  
Yek caran dirûşma Partî û Artêşê me  
Yek carna jî helbesta dilê Zehrayê  
me

Wekî min got ez r̄ewî me dayika  
min!!

EŞREF YAŞAR/GIRTİGEHA  
BARTINÊ

\*Çewran: Li hêla Pasûrê çiyayek

## Livbazi

Sebir kişandin  
li ber kevirê bêdeng  
Xwêdana mezeloq  
Zora xewê  
dengê çivikan  
germa tavê ya gelawêjê  
Û ez...  
Şivanê berbangan  
Rêwiyê şeva reş  
Xwediyyê roja reben  
li ber siya vî kevirî  
ker û lal...  
Û ez li ber vî kevirî  
mame li benda fermanê  
Dîsa fermanêni di dilê min de  
wê bênen...  
Û ezê biteqim  
li ser serê cahş û wehşan  
û wê xwîn li rûyê tavê bikeve.

Lê min parastina tavê  
hildaye ser milê xwe  
Divê ez nehêlim  
Tav birîn bibe  
di vê livbaziye de.

ÇIYA MAZÎ

## Hışyar Ma

Yew ser bena ku ti şî rehmê Homayî  
Ez zana ti nika mi ra pers kenî  
Kurdistan çi biyo, çi nêbiyo?  
Bê ez çinê ko zana, to rê bivacî

Taziye to da ïnan ku to şinasnenî  
Her kes an ame yan jî telefon rasayı

Sersaxiya welatê ma, Nihat ra wa  
yişti

Bê ey embazê ma wo, qedir nêzanî

Zerê kezeb ma hemiyanveyşa  
La a Mistfa Axê heliya û rasay to wa  
Zaracê to hema jî halîn xo da wa  
Zê to ya jî welatê xo terk nêkena

Leyrê vergano qesmero ko vîtrîn di

Riha da Muhsin Melik ci keso  
Çewlig da jî Hisyar Ağaoglu ewo

Çewligic zanê ku lapata verina tu wa  
Komela kurdan a verîn tu kerda  
Vera dişmen gulle o verîn tu tecna  
Kutiko har o ku ti dima bî, Zeki Pa  
labiyik qelda  
Nika jî na vîr awa Mûrad, Gelyî  
Rîzic vinerto

Pelek dilşewat di bin lingan de  
Tenê...

Di xaniyekî... di gundekî deh mal de  
Her yê xwe ji kayê bernedîda  
Çemîn li wê derê  
Ne bi xatir in  
Ji bo vegera beravajkî rojekê...  
Mirov lal in  
li wê derê...  
Kenê xwe jî sibeha  
Bi livînan re radikin  
Di wecê wan de  
Kuştina bav û kalan...

ŞEXMÜS SEFER

## Du çêj

Heke tu dikî  
Mîna çav û kil  
Bi can û dil ji xwe hez bikî  
Berî her tiştî  
Jî kesayetiya xwe ya  
Mîna doxîna sist bîz bikî

Paşê jî gere  
Nola dizekî pispor û bêxetere  
Bi başî û bi xweşî  
Kûr bi kûr  
Di neynika hişê xwe de bimeşî  
Û wekî du kevraşî, herî werî  
Paşeroja xwe ya kevn  
Di nava xwe de bihêrî

Û mîna roja bêtav  
Li hemû tenîş û navend û navberê  
Lêker û bûyerên daringî û derûni bi  
nihêrî

Li pey vê tevgerê  
Rewşa xwe ya  
Mîna doxîna bêgirê  
Bi axîna heval û hogirê  
Çil mîlyon Kurdistanî  
Hem bişewitînî  
Hem bidî ber şûr û kîrê  
Azadiya zêstanî

Heke tu dikarî  
Vî arî  
Bi dûrebîniya Ehmedê Xanî  
Û bi arama serokê êş û janê  
Bigihînî destê jiyanê

Heke tu dikarî  
Vî barî  
Mîna Ciayê Cûdî û Gabarê  
Bêgilî û bêgirî  
Hilbigirî

Heke tu dikarî  
Vê kesayetiya xwe ya tarî û ketî  
Bifîlî û biqetî  
Û vê mijara pîroz  
Bi hêsanî bibî serî  
Tu Mazlûm î, tu Egît î  
Tu Zilan î, tu Sema yî, tu Eser î  
ILHAMÎ ÖZER



naboro,

Zê her fir gurey ey gecêk ji qedîna û  
da pero kiş

Va "Ranza ra gina wo ard, sarê xwe  
şikito,

Dima ji hêrs biyo û xwe xeneqina  
wo"

Edî perdê ku çiman vera bî, darêy  
we

Goşan ku ceng girewte bî biya  
Jîtem da tu ra vati bi "welatê xwe  
terk bike"

Tu ji va bi "Mêrg xwe qayila, la we  
lat terk nêkena"

Nika her kes fêhm kerdo ku

Tu şehîdê Welatî

Şar ma tim pêy tu wasifiyeno

Amed da Wedat Aydin çi çiyo,

We vîr awa jî Zoxpayic ma ho pa  
weno

Neyar sekeno nêkeno, nêşkeno ïnan  
we bikiro

Ez bawer kena ku na nesil ma xelas  
neno

Çinkî ristim ïnan, hareyên mazêran  
ma ra lûl biyî

Hem Jahre yî, hem jehat î û hem His  
yar î.

DOŞÊ EVDAL

## Dîmenek

Li vir zimanê erdê jî heye

Ê ku jê fêm bike

Tu dar xwe jê dûr naxe

Ji şiliyê, berfê û baranê...

Qorînek dara tûyê hate min

Wê rojê

Bernameya Navenda Çanad Mezopotamya  
Tohum, saet:14.00  
NÇM İzmir

- 16.01.99 şemf: Konsera Koma Gülen Xerzan li Navenda Çanda  
NÇM'ê, saet:18.00
- 17.01.99 şemf: Konsera Agirê Zerdeş 'Garan', saet:17.00
- 20.01.99 çarşem: Şahiya Cejna Remezanê. Amedekar: Xebatkarê  
NÇM'ê, saet:18.00
- 21.01.99 ïn: Konsera Koma Çiya "Rozerîn", saet:18.00



## YÇKM

Film: "Afrîkaya min", saet:16.00

- 17.01.99 yekşem: "Berxwedana wan senfonyek e, dom dike", Em bi bîr tînîn Koroya zarakan a NÇM'ê, Koma Murzur, Pêşandana DIA'yê.
- 17.01.99 yekşem: Bi peşkêşkirina Naime Ekincioğlu semînera Tiyatroye ya li ser Doktrîna Tiyatroye ya Meyerhold, saet:11.00-13.00
- 20.01.99 çarşem: Semînera li ser felsefeya sincê. Cengiz Gündogdu, saet: 18.00-20.00

Piştî 16 salan Rê, rî bi rî hate Tîriyeyê

# 'Rê' di reşemiyê de derdikeve sînemayan

Yılmaz  
Güney  
senaryo  
ya filmê  
"Rê" li  
girtîgehê  
nivîsibû.



Yılmaz Güney di hevpeyvîneke xwe ya digel M.Baksî de ku di kovara  
Nûdemê de hatibû weşandin, wiha gotibû: "Me bi filmê 'Rê' dîmena  
mirovê Tîriyeyê û Kurdistanê û rewşa civakî raxiste ber çavan. Me navê  
Kurdistanê bi kar anî. Lewre dewletê navê xayintiyê bi pey me xist."

**W**ekî tê zanîn, filmê Yılmaz Güney 'Rê (Yol)' ligel ku li hemû cîhanê hate pêşkêşkirin û xelatkirin li Tîriyeyê hatibû qedexekirin. Piştî 16 salên qedexekirin wê li Tîriyeyê di meha reşemiyê de derkeve pêşberî temaşevanan.

Filmê Yılmaz Güney "Rê" ku li Cannûse xelata Palmiyê ya zêr standibû, bi xebatê İmaj-TV û Wefqa Yılmaz Güney a Çand û Hunerê bi teknik, efekt û muzîkê hate nûkirin, wê di reşemiyâ 1999'an de li sînemayan bê nişandayin. Ji bo vê pêşketinê ji aliye İmaj-TV ve bo çapemeyî daxuyanî hate ragihandin.

Civîna daxuyaniyê, roja 8'ê rîbendanê li avahîya İmaj-TV'ye pêk hat. Di daxuyaniyê de hevala Yılmaz Güney Fatoş Güney diyar kir ku lêçûyîna nûkirina film 150 milyar TL ye.

Li gorî Fatoş Güney, Yılmaz Güney huner-mendekî bijarte yê sînemayê ye.

Bi dû axaftina Fatoş Güney de, lîstikvanen filmê "Rê" Halil Ergün, Tarık Akan û çêkerê muzîka film Zülfü Livaneli û hunermendênu ku ji bo pistgiriyê hatibûn, Ferhat Tunç û Suavi derketin ser sehnê û pirsên nûc岐ighanen bers-vandin.

Tarık Akan diyar kir ku sînemaya tirk ne hê-

san e ku lîstikvanekî wekî Yılmaz Güney bibîne. Akan wiha got: "Yılmaz Güney dehayekî sînemayê bû lê ya girîng ne tenê nasnameya hunermendî, nasnameya polîtîk ne kêmî nasnameya wî ye."

Tarık Akan diyar kir ku ewê jî filmê 'Rê' cara yekem di sînemayê de temâse bike.

Filmên Yılmaz Güney ên navê wan li jêr in jî, di salêr cur be cur de xelata senaryoya herî baş standibûn:

**Hêvî** (Umut)–1970

**Zêmar** (Ağit)–1971

**Kerî** (Sürü)–1979

**Dijmin** (Düşman)–1980

Rê de festivalên cur bi cur ên navneteweyî de xelat standibûn. Her wiha wî xelata zêrin bi filmê "Winda" yê rîveberê yewnanî Costa Gavras re bi hevbeşî girtibû.

Hin filmên wî: Dîwar, Gurên Birçî, Seyit-xan, Jan, Heval û hwd.


Yılmaz Güney di sala 1931'ê de li Edeneyê hate dinê. Di 9'ê rezbera 1984'an de li Fransa yê çû ser dilovaniya xwe.

Diya wî ji Müşê, bavê wî ji ji gundekî Siwê-regî ye.

SERWÎSA ÇANDÊ

## TİŞK

Lem qonaxe da



## BEKIR ŞIWANÎ

**E**m rojane ke gelî kurd şerî man û neman dekat û legel mêtû da le hênan û bîrda da ye û deyewê girewî mezîn berêtewî, pêdawîstî qonax naçarî dekat zor be wîrdî legel barûdox hel-sukewt bikat û çawî le kar û kirdey dost û dujminan bê. Wek dezanîn dewletî turk mawey 20 sal e şerekî bê amanî sepandiwe be ser bakurî welaî eme da û ter û wişk pêkewe desutêne. Bêguman Emerîka û Ewrûpa lem şere kawilkare da pişgirî bêşînur le dewletî turk deken û hênedey tir barî em mîlete giran deken û be şeweyekî çalak le piroşey tiwanewe û lenawçûnî da besdarî deken. Dirindetirîn rîjêmî em çerxe be hawkarî ew dewletane, zêd û warî kurdan kawil dekat û têdekoşê rîşey em mîlete kon û dêrîne le bin derbêne. Bo em mebesteş hemû rîgâyekî narewa û nayasayı taqî dekatewe û le yasa û dabûnerîtî nîdewletî bakî niye.

Hemû tawanekanî le ser destî gewre lêpirsrawanî dewletî turk û be berçawî rojawewe encam dedrîn. Metîrsî gewreş lêra da ye, çunke ew dewletaney xoyan be demokrasî le qelem deden û bangeşey parastinî mafekanî mirov deken, debînîn hawbeşî ew şere çepelen ke beser bakurî Kurdistan da sepêndiraw. Ke gelî kurd bînî wa be niwîjî niwero û be berçawî hemû cîhanewe qîr dekrê, naçar bû dest bidate çek û bitwanê le mayekî kam da, belam paş bexşînî qurmaniye kî zor, dengî xoy be cîhan bigezenê.

Belam debînîn ke Emerîka û Ewrûpa serbarî zanînî hemû em rastiyane, wîstî gelî kurd û serkirdayetî şorişî ew gele feramoş deken. Tenanet hendê car rûberûy debinewe, bo nimûne eweta balyozî Emerîka le Enqere radegeyenê ke nexşey rojî 9'î rezber dij be Serokî Giştî PKK A. Öcalan, be serperişî ewan encam diraw. Emeş be hengawêk dadenrê bo rizgarbûn le serokayetî şorişî gelî kurd, ewîş leber ewey le gor wîst û daxwazî ewan niye û sazîş lesor mafê rewakanî netewey kurd nakat. Belê amanc ewe ye serêkî wa le cestey bizutinewey rizgarixwazî gelî kurd bibestrê ke le serok hoz biçê nek serokî bizutneweyekî neteweyî, herweha pir be pêstî rojawa bê û le layen ewanewe araste bikrê û bitwanê le bazney berjewendiyekanî ewan da bixulêtew.

Belam mêtû gewahî dedat ke hawkaranî zilhêz û dagîrkeran le hîç şîwênen xoyan bo ranegîrawe û beişyan her nuşust û têkşikandin buwe. Baştırin nimûneş bo em boçûne, hukurnetî hawkarî Emerîka le Vîetnam û hukumetî hawkarî Fransa bû le Cezayer. Gelî kurd le nizîkewe û zor be wişyârî be diway gorankarî û rudawekan da deçê û heman katîş dezanê ke tenya rîgây rizgarî, dirêjedan e be rîbazî şehîdan, ewaney ke le pênavî azadî mirov û derhênanî gelî kurd le qurpî dirindey mêtû da seriyan nawetewe. Herweha em gele paş hazaran salîş, hergîz ew tawanane le bîr nakat ke dijî encamdiraw.

# Ji Mûş û Goyanê dûrikên govendê

**Biwêjine ji herêma  
Ruhayê (Sîwêreg)**

**'GEREK MIROV  
Lİ SER BÊRÊ  
BIEDILE'**

- ❖ Kî aş e, tu qeras î
- ❖ Kêfa wî wek kêfa kerê nêr e
- ❖ Wek mîşa di kundir de ye
- ❖ Wek pisîka gûyê xwe veşêre
- ❖ Wek benîstê nav dirana ye
- ❖ Wek marê kor e
- ❖ Wek gûrê dev bi xwîn e
- ❖ Wekî rîvî kone ye
- ❖ Keramperê (histî) ber bê ye
- ❖ Bûne mişk û ketine nav malê hev
- ❖ Xwedî sîniya erdê ye
- ❖ Wek rîviyê li paş xwe nanêre
- ❖ Tu şîv î ez paşîv im
- ❖ Wek benîstê mezeloq e
- ❖ Nan di dev şêr de ye
- ❖ Nan di tehtê de ye
- ❖ Wek pisîka xwe bide ber goşt
- ❖ Hesinekî bavêje ber lin-gan
- ❖ Mîx ketiye avê
- ❖ Wek ava delavê ye
- ❖ Me hal e, we çi hewal e
- ❖ Wek çîra ku tu pîfke
- ❖ Bawerî bi dijmin tê, bi te nayê
- ❖ Tira me bi deng e
- ❖ Wek dara bêav bimîne
- ❖ Wek dîkê tu avê lêkî
- ❖ Wek kevirê qoziya ye
- ❖ Peyv pere nake
- ❖ Wek kosê bûk ji ber çavan wenda bibe

BERHEVKAR:  
FIKRET NALÇEHXANÎ



## Ha bi dar e

*Ha bi dar e, bi dar e, bi dar e, kuro  
Seriya çolyanê bi dar e  
Lê di çêriyan berx û kar e kuro  
Lê diçêriyan berx û kar e  
Derdêm keçika muxtar e, kuro  
Derdêm keçika muxtar e*

*Ha bi bî ye, bi bî ye bi bî ye kuro  
Seriya çolyanê bi bî ye  
Lê diçêriyan berx û mîh e kuro  
Lê diçêriyan berx û mîh e*

*Derdêm keçika cindî ye kuro  
Derdêm keçika cindî ye*

*Ha bi hez e, bi hez e, bi hez e kuro  
Serê çolyanê bi hez e  
Lê diçêriyan berx û pez e kuro  
Lê diçêriyan berx û pez e*

*Derdêm keçika terez e kuro  
Derdêm keçika terez e.*

## Hey zâlim

*Hey la lo dilo, hey zâlim  
Koçer im xerab mal im  
Kurmanc im bêpergal im  
Ji derd û halê te dinalim*

*Hat karwanê Mûşê yo  
Danî li dora hewşê yo*

*Hat karwanê Gergerê  
Danî li rasta bênderê*

*Hey la lo dilo, hey zâlim  
Koçer im xerab mal im  
Kurmanc im bêpergal im  
Ji derd û halê xwe dinalim.*

## Ha Gulê

*Ha gulê lê lê, wî gulê lê lê, wî gulê  
yeman  
Ha gulê lê lê, wî gulê lê lê, sorgulê  
yeman*

*Gul çîçeka devê çema  
Ba lê rabû heb jê nema  
Gul layiqê lawkê bega*

*Ha gula li aşa, çi gula li aşa  
Te sûret sorê da ber maşa  
Gul layiqê lawkê paşa*

*Ha gula li baxa, çi gula li baxa  
Te sûret sorê da ber daxa  
Gul layiqê lawkê axa*

*Ha gulê lê lê, wî gulê lê lê, wî gulê  
yeman  
Ha gulê lê lê wî gulê lê lê, sorgulê  
yeman.*

## Êmo

*Êmo stêrka sibê ye  
Wey lê lê, wî lo lo wer Êmo  
Wey lê lê, wî lo lo tew tew*

*Zevî tev beyar e  
Beyar bê giha ne  
Giha bê derman e  
Orman bê dar mane  
Bostan bê av mane  
Gulan çîçek dane  
Eniya te meydan e  
Brûyên te qeytan e  
Çavê reş kil dane  
Singê te zozan e  
Diranê te mircan e  
Devê te dikan e*

*Dikana xortan e  
Mérê te bi qurban e  
Tu gul î li nava dilê min*

BERHEVKAR: ROŞAN LEZGIN

## Hey gul

*Hey gul, hey gul hey gulê  
Govenda bûk û zava  
Dem dema gul bîşkiftin  
Pêjanokan hilmiştin  
Govenda bûk û zava  
Gul zerîyan diyarî hiştin  
Reş kezî diranê stûrde  
Govenda bûk û zava  
Hey gul hey gul hey gulê  
Ew gula geliyê şaxê  
Reş kezî ket kemaxê  
Govenda bûk û zava  
Şahî ye li mala axê  
Govenda bûk û zava  
Hey gul tu olaş î  
Govenda bûk û zava  
Poşiyogê bike şâşî  
Govenda bûk û zava  
Bêbextê ji dewrê paşî  
Govenda bûk û zava  
Hey gul, hey gul hey gulê  
Hey gul tu esmer î  
Poşiyogê bike serî  
Govenda bûk û zava  
Bêbextê ji dewrê berê  
Govenda bûk û zava  
Hey gul, hey gul, hey gulê  
Esmerê nazê gulê  
Govenda sil û milê  
Govenda bûk û zava  
Çavê reş tejî kil e  
Govenda bûk û zava  
(Ev bêrît, dema bûkê radikin dibin  
mala zavê tê gotin)*

BERHEVKAR: RÊBER RON

# Dê Hêlin jî rojekê azad bibe

Piştî romana "Gundikê Dono" pirtûka duymen "Hêlin" a Mahmut Bakşî jî li Tirkîye û bakurê Kurdistanê hate weşandin. Her wekî romana yekemîn, di vê romanê de jî rastiya tal a civaka kurd li ber çavan hatiye raxistin. Weşanxaneya Perî digel weşandina vê romana ku li Ewrûpayê bi zimanê cur bi cur hatiye weşandin ku du xelatên navneteweyî girtine, wergera tirkî ya romana Gundikê Dono jî daye ber çapê.

Her wekî li jor hate diyarkirin nivîskar Mahmut Bakşî bi vê romana ku li gelek zimanê biyân hatiye wergerandin "Xelata 1998" an a Ciwanê Nemseyê" û "Xelata 1998" an a Kobrayê Shin a Swîsreyê" wergirtiye.

Roman dîmeneke rasteqnîn ya civaka kurd li ber çavan radixe. Büyer ji devê keçika bi navê "Hêlin" tên veguhestin. Nivîskar di dema vegotinê de bi zimanê keçekê rexneyên xwe yên li dijî dab û nêrîten paşverû yên civaka kurd dibarîne. Di vî warî de helwesta bavê keçikê ku mamosteyekî welatparêz e, hêjayî dabaşê ye. Mamosteyê navborî bi helwesta xwe ya paşverû gir û rika derdorêna paşverû dikişine, lê bi xwe jî nikare xwe ji nexweşiyên vê civakê bişo. Li aliyejî ji gundiyan re dibêje: "Cudatiye nexin nava zarokên keç û kur" li aliye din bi xwe cudatiye dixe navbera keça xwe Hêlin û kurê xwe Azad ku her

jî cewî ne.

Heta ku zilma neyar dest pê bike, nakokuya di navbera kesen pêşverû û paşverû de li pêş e. Mamoste nûnertiya aliye pêşverû dikin. Di romanê qala mamosteyekî tirk jî tê kirin, lê ew jî leqayî zilma dewletê tê. bi vê yekê jî xuya dibe ku ew mirovîkî pêşverû û şoşeser e. Li aliye din meleyê ku wekî nûnerê bereya paşverû hatiye destnîşankirin jî piştî zilma cendifirmeyan têkiliya xwe ji her tişt qut dike.

Di romanê de jî diyar dibe ku doza welat serî li her tiştî girtiye. Lewre di destpêkê de nakokuya di navbera Azad û Hêlinê de li pêş e, piştîre nakokuya di navbera mamoste û mele de tê dikirandin, lê piştî ku cendifirme davêjin ser gund û mamosteyan digirin, hestêne nete-



veyî, gir û kîna li hemberî zîlma dijmin serî li her tiştî digire. Ê dî gundi bi awa - yeki

veşarî be jî li hemberî dijmin gotina xwe dikin yek û Hêlinâ ku büyeran vedibêje jî gir û kîna li hemberî birayê xwe û helwesta neyinî ya malbata xwe jî bîr dike.

Roman bi awayekî giştî serpêhatiya gelek mirovan lê kurd a piştî cuntaya faşist tîne zimên. Ji zilma Zindana Ahmedê bigire, heta şerê çekdarê kurd, ji rewşa gundêni ser sinor û kurdên Binxetê bigire heta şerê Lubnanê gelek tiştîne vegotin.

Nivîskar di pirtûkê de zimanekî gelêri bi kar anîye. Lî di bikaranîna hînek peyy û biwêjan de ji vê yekê avarê bûye. Bo nimûne hînek peyyen wekî ciyawaz, wîlo û tewandina navdêren nêr bi qertafa /i bi devoka herêma Xerzan naakeye. Lî xweziya nivîskar karibûya xwe jî çewtiyên rîzimanî yê devoka Xezran jî bida alî. Lewre ew çewti serê kesen ku ne ji wê herêmê ne tevlîhev dike û xwendina pirtûkê dijwar dike. Bo nimûne di hevoka "lê leşkeran vê kefê ji me distandibû" de rîpîvanê tewangê hatiye binpê kirin, mînakên bi vî rengî her wekî devoka herêmê di pirtûkê de jî serdest in.

Di dawiyê de mirov dikare bibêje tevi hînek biwêjén ku bêhna tirkî jê difûre jî, zimanê pirtûkê çej û tama kurdîya gelêri dide mirov.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Rewşenbîr û reşebîr

HASAN KAYA



Dema ku kesatiya kurdan a lipaşmayî tê holê, mînakek heye ku ji aliye her kesî ve tê gotin: Çawîşekî tirk ê şal bi pîne, ji bijîşkekî kurd bêtir hêja bû li ber çavên kurdan. Dîsa tê gotin ku; dema zanayekî kurd bi tirkî dipeyiî rîz jê re dihate girtin. Lî dema ku bi kurdî dipeyiî tilsimâ xwe winda dikir. Ev tesbîteke civakzanî ye. Di serî de sosyolog î. Beşikçi, pey re jî gelek kesan ev tesbît kiriye. Helbet civaka kurdan, bi gelempêrî nebe jî ev nexweşî li pey xwe hiştiye. Di mîjî de hêdî hêdî bandora mîtingeriye ji holê rabûye. Têrê nake, dibe ku divê hêj bêtir ev bandor ji holê rabe.

Piştî ku min bala xwe da ser vê tesbîta jorîn ez dikarim tiştî de binê zimanê xwe de derxim û rasterê bême ser dabaşa xwe. Tesbîteke min jî heye ku iro hînekî şûna wê tesbîta jorîn girtiye. Hînekî bi rojevê ve jî girêdayî ye. Têkiliya vê tesbîte bi pîrsa "rewşenbîr kî ye" re jî heye. Em iro dibînîn tu nivîskar, lêkolîner, hunermend, şair, zana û xwendayê/a ku di xizmeta têkoşînê de ne, xwe rewşenbîr nahe-

sibînîn. Tu kes rewşenbîrên ku xwedî rîexistin in, ronakbîr nahesibîne. Dibe ku kes bi devê xwe vê yekê nebêje lê di jiyanê de û di binê hişê mirovan de wiha ye. Piştî çavdêriyeke dûvdîrê ez gîhiştime vê encamê. Ne ku ez reaksiyonekî tînim zimên. Mînak em bibêjin civîneke rewşenbîran heye, gelek bijîşk, avûqat, mihendizên ku bi rastî jî têkiliya wan zêde bi kurdâyetyê re tune û kedeke wan a zêde jî tune ye têne vexwendin. Lî gelek bijîşk, evûqat, mihendiz em dev ji van berdin nivîskar, lêkolîneren ku hînek hunerên wan hene, keda wan heye û têkiliya wan bi kurdâyetyê re heye, nayêne vexwendin. Çîma ku dilxazîn PKK' ê ne.

Di nav kesen ku dibêjin em bêalî ne (qaşo), em bi siyasetê re ne têkildar in, em bi tenê rewşenbîr in de baweriyeke bi vî rengî heye. Ev tiştîkî eletewş e û li tu devêra cîhanê tune ye. Bi rastî ez naxwazim zêde xwedîyên vê ferasetê rexne bikim. Çimkî ez dizanîm li hemû welatan beriya ku mirov bibine şoşeser, rewşenbîr û hwd. pêşî mutleq û mutleq dibine mirov, dibine xwedîyê wijdaneke paqîj. Mirovên kêm wijdan ger bêne rexnekirin dê çi bê guhartin.

Rexneya min li me ye. Li sazî û rîexistinê şoşeser ye. Çîma rexneya min li me ye. Ji ber ku di pratikê de me qîmeta rewşenbîr, zana û hunermendên xwe nezaniye. Me bêtir qîmet daye kesî li derveyî rîexistinê. Lewre rewşenbîr û derûdorê sexte jî tu qîmeti nadîn ên me.

Di van rojên dawî de gelek civînê rewşenbîran çêbûn. Helbet me jî hem wekî şexs û hem jî wekî Înstîtuya Kurdi ev civîn ji nêzîk ve şopandin. Ji aliye kesen ku besdar bûne û ji aliye rojey û axaftinê ve bêhna sextebûnê tê pozê mirov. Di wan civînan de gelek mirovên ku heta niha ji kar û barê taşeroniyê, ji karê mutahîtî û bazirganiye wext nedîtine ku êvareke îñê nanekî bi xêra xwe bidine kurdekî, hene. Niha jî wan navê rewşenbîriye li xwe kiriye û bi niyeta gorbaşan dibêjin em sivîl in, em paqîj in.

Di vê dabaşê de tenê yek rî li ber me heye. Heta ji me tê em rîz, qedr û qîmete bidin hev. Rê li ber hev vezin. Ji ber ku em seraqt di nav hev de ne, êdî gelek têgî karîkatûrize bûne. Mînak peyva rewşenbîriye di nav me de bûye wekî tiştîkî nebaş. Hunermendên me, xwe cidî nabînin, psîkolojiyeke wiha bi wan re çêbûye, dema mirov ji wan re dibêje rewşenbîr, ew dibêjin na em gel in. Mirov bi xweşibandinê nikare ji ruhê gel fam bike. Bi tenê heke mirov rola xwe baş pêk bîne, mirov dikare nêzî gel bibe. Ne dûrketina ji gel baş e, ne jî mirov bibe dûvikê gel tiştîkî maqûl e. Divê mirov pêşî jî xwe hez bike da ku mirov bikaribe ji gel jî hez bike.

Wiha dixuye ku em di bihurekî re derbas dîbin. Karê me ne hêsan e. Lî piştî reşiyê rewşenbîr. Lewre pêşeroj a rewşenbîran e, ne ya "reşebîran".

Markeya sarinca min Beko ye

**L**i gundê Banqirê ku girêdayî nav-  
çeya Şemrexâ Mêrdînê ye, pîreke-  
ke bi navê Hecî Fatê hebû. Ev pî-  
rek geleki pîr bû û temenê wê gîhîstibû  
sed û pazdehan û hêjî pîra Hecî mîna  
ciwanan li ser xwe bû. Ev pîrek ji Mal-  
bata Bekir bû, lê kesî nedigot malbata  
Bekir digot Mala Beko. Rojekê miro-  
vekî ku ji heman gundi bû ji xwe re sa-  
rincakê (buzdolabı) distîne lê dilê mi-  
rov geleki taswas e. Xwediye sarincê  
diçe cem Evdilsemed. Evdilsemed ne-  
vîiyê Hecî Fatê ye, jê dipirse û dibêje:  
“Heyran bi xwedê min ji xwe re bi xwî-  
na mîrekî sarincek xistiye stûyê xwe,  
ku tu bihatayî, lê binêriya bê markaya  
wê sexlem e, an ne saxlem e.”


Ebdulsemed dibêje: "Marka sarinca  
te ci ye?"

Zilam dibêje: "Markeya wê Beko ye."

Ebdulsemed dibêje: "Hema bi namûs ne hewce ye ez bêm binêrim, li ser xêrê be hema gelekî saxlem e."

Zilam dibêje: "Ma tu çawa pê dizanî markeya wê zexm e an na?"

Ebdulsemed dibêjê: "Ê heyran bi xwedê pîra min ji mala Beko ye, gelekî zexm derket, ji ber vê ez bas pê diz-



nim û dibêjim pêwîst nake ku ez bêm lê binêrim!"

Neeûzû bîllah ne dîn  
maye ne îjî îman

Mirovekî ji Amedê, kurekî wî li Sîdeya navçeya Antalyayê di aşxaneyekê de dixebeitî yekî jî li Amedê pêlavên xelqê boyax dikirin. Wî jî erebeya hes-

ye ne îman.'

Kurê wî yê li ba wî dibêje: "Bavol Dev jê berde tu bi şewqaya xwe nikar bi van kesan re derbixî. Ancax te berçavka hespê kûmeyt baniya, te bida ber çavên xwe te dikarî serî bi van re derbixî!"

Baş e çîma tu bi  
tîrkî diaxivî

Mirovek bi destê birayê xwe yê bi  
çük digire û li saziyên welatparêz dige-  
rîne. Ku diçe kîjân saziyê, ji bo ku za-  
rok baş fêm bike dibêje: "Binêre e  
mal, mala gelê kurd e", ji wir radibe di-  
çe yeka din dibêje: Ev jî, ev jî, ev jî,  
dawiya dawî diçe li NÇM'ê rûdîne  
dibêje binêre ev jî, mala gelê kurd e  
Hema di wê demê de xebatkareki  
NÇM'ê destê xwe dirêjî gepa zarok  
piçük dike û dibêje: "Ya, ya, görüyor-  
musun, kurtlerin evi ne kadar güzel-  
dir," lê lê ... tu dibînî mala kurda çığa-  
xweşik e.) Zarok jî dibêje: "Baş e, ge  
ev mala kurdan be çima hûn bi tirkî di-  
axivin?"

BERHEVKAR: FATİH BENDEWAR

# **BI XELAT...**

## XACĘPIRSA BI XELAT (155)

**XACEPIRSA**

Orya Rewards was dari wewe	A	A	Grawiek Drewieko	E	Wriet Rutegrik	P	Grop dar	K	Meltek
F	R	:A	N	T	Z	F	A	N	O
Plakaya Tukayay	T	R	Grawiek Kudayek yewwah	V	Rhet	A	R	A	M
Derman	P	E	V	A	J	O	E	Z	S
Bajar Sembako okupasi	S	A	R	Xia	L	E	Z	K	A
O	Prenan	N	E	S	I	R	H	H	N
	Mal						He, hng		
							Kedewet		
Mebete	X	S	A						
T	A	X	M	I	N	A			
Barayek Sayang Dendema ne	N	A	S	A	Cejil magan	I	A		
L	i	S	A	N	S	Uperke karddi	I		

**Bersiva Xaçəpirsa 153'an**

# DONO'NUN KÖYÜ

Marianne Boksi

Xaçepirsa me bi xelat e.  
Di 15 rojan de ci bersiv  
biginhêjin ber destê me, em dê  
wan binirxinin û bi riya pişkê  
li 5 kesan belav bikin. Xelata  
hejmara me ya 155'an pirtûka  
Mahmut Baksi 'Dono'nun  
Közü'ün

Jérenot:

*Ji bo ku bersiva we*

*xandin, divê hûn "Peyvî  
Veşarî" di nava qutiyê  
bin xaçepirsê de binivî  
teví navníşana xwe ji m  
bişinîn.*

Pênc kesên ku xelata 153'an Pirtûka Feqiyê Teyran 'Ey avê av' qezenç kirine ev in: Esat Ronî/Êlih, Medeni Yamaç/Îskenderun, Şahin Enç/Malatya, Hüseyin Tunç/Stenbol, Aziz Akşahin/Semşür

Uçurtma Niviskarek i İtali wêne	Erakek Orjinal	Benê serê hespan Dengdarê n bora	Tipeke kurdi Dengdarê n ole	Çiyayekî Kurdistan ê Tipek		Lawaz
				Ne avi		
				Ne hişk		
Anlayış					Xwedayek	
Wiło					Di sen- trençê de têkçûn	
	2		Tipa pêşin Vegetande kek	Navekî mêran Ne bejî		
Daçekek		Çiyayekî Kurdistan ê Mehek				
Beriqoq, ronahi						
			Dengdarê n Jan		Hezar kilo ... Luxembur g	
Tipek		Rêxistina îrlandî	Jêhatî Vegetande k		1	
Sembola hidrojenê	Dewletekî ciran Dengdarê n tûj			Bi tirkî leşker		
Şimendife r				Kesê yekemin		
Sewal						
	3		... Güler wênekêse kî tirk			
		4				

PEYVA VESARÍ



# Kerdenê Fedayîtin

**K**esên ke semeda armanca pîroz dest erzenê çalakiyanê xofedakerdin, ïnan ra bi kurdî vajiyeno canfedatî, yan jî fedayîti. Dîroka ma de fedayîtin, bêbextîn, qehramanîn û xayînîn pêzere de yê. Cayo ke zordestî, zilm û barbarîn tede zêde (vêşî) yo, bêguman wişa de fedayîtin jî hend zêde yo.

Dîroka cîhanî de fedayîti kerdenanê pîlotanê japonan ser namdar a. Ïnan seranê 1944 û 1945 de bombey bar kerdî tiyaranê xo û zey pîkekerdina xo varnayê keştiyanê (gemi) Amerîka ser û ê eskerana piya îmha kerdê. Goreyê vatenan o çax bi hezarana kerdenê fedayîsin virazyayê û nezdiyê 250 keştiyê Amerîka îmha kerdê. Nê kerdenê fedayîtin jî nameyê "Kamikaze" ya yenê silasnayin.

Gerîyananê IRA ra Boby Sandsî jî embazanê xoya piya rojeyê mîrîg (merden) girot, hetanî merd çikek nîwerd û nêsimit. Resay miradê xo tahdîyê girotxaney vindarnay. Gerîyananê Filistîn jî bombeyê kîmyewî bar kerdê kamyonan û zeriya dişmenî de teqnatayê û teqnenê.

Amerîkayîjan çermesûrî (kuzilderili) qir kerdî, êkê mendî jî kerdî vila. Welatê ïnan dagir kerd. Çermesûrî bî xeribî, ê bî wayirê welati. Ray ray ma filman de teşâye kenê, la belê destê ma de vera qirkerdina amerîkayîjan, fedayîfina ïnan a nustî çiniya. Eke esta jî ez nêzana.

Wexto ke ma ewnenê dîroka ma kurdan, barbarîn, zilm û wahşeto ke ma kurdan rî viraziya yo qe cayê de cîhanî de kesî rî nêviraziyo. Welatê ma kero letey

Ê ke qey Kurdistanî şer kenê û vernî de şinê, pîro fedayîyê. Zey kamîkazeyan û Filîstînijan gerîlayê ARGK 'ê jî bomban girêdanê xoya û ïnan zeriya esker û polîsan de teqnenê. Na ray embaz Zîlane Dêrsim de akerd û embazê ay jî Sêwas, Adna, Gever, Lice, Wan û Başûrê Kurdistanî de raya ayra şî.

letey, dişmenan a kiş û na kiş ra visto ma wa, ma kerdê xînt, korfehm û dengsare. Dema ke ma hesiyymi xo û sereyê xo kerd berz, fedayîfina ke ma kerd riye cîhanî de ne kesî kero ne diyo û ne jî eşnawito.

Ê ke qey Kurdistanî şer kenê û vernî de şinê, pîro fedayîyê Kurdistanî yê. Zey kamîkazeyan û Filîstînijan gerîlayê ARGK 'ê jî bomban girêdenê xoya û ïnan zeriya esker û polîsan de wileta tirk de teqnenê. Na ray embaz Zîlane (Zeynep Kinaci) Dêrsim de akerd û embazê ay jî Sêwas, Adna, Gever, Lice, Wan û Başûrê Kurdistanî de raya ayra şî.

Terteleyê Dêrsim peyra xeylê keynan û veyvan vera zilm û barbarîna dewleta tirk xo kendalê awa munzûrî ra eştîn aw miyan û xeniqayê. Xo teslîmî dişmenî nêkerd.

Ancî Leyla Qasim zey wastena Saddamî nêbiyayin, merdin qabûl kerd. Sera 1992 de jî gerîlaya ARGK embaz Berîtanê qandê (serba) teslîmî pêşmerganê xapaynayinan nêbiyayin xo kaşanê Zap ra virada war û teslîm nêbî. Fina jû Gerîlaya

ARGK Sêwreg de tepiyyê. Eskeran a dê caşanê Bucak dest. Cahşî ay nîşaynenê jû ereba û wazanê berê a ray de winî kena ke ïnan finena faq. Wexto ke mabenê Ruhâ û Sêwreg de şinê embaze xafidera xo çekena direksiyonê ereba ser û tadena jû tire (erebeyê derg) bin û xoya piya hem serokcaşî û hem jî caşanê bînan kişte. Yanê zey embazanê bînan wastena caşan ci pîre ra ana.

Xortê kurd Erdal Aksu rojê pîrozkerdin sera 75'ina dewleta tirk de jû tiyare remnî. Aksu tiyera remnayina kişte ra jû raya kerdina fedayîtin akerd, kişte ra Peymanê Lozan yanê leteybiyayinê welatêma, fina (hona) ard çiman ver û kişta bîra jî pîrozkerdin sera 75'in, ci qırık ra ard û kîfî ïnan herimna.

Ma kurdan miyan de fedayîti yo taybeti esto, xoveşnayin. Na ray jî embaz Mazlum Doğanî Newrozî sera 1982 de Zindanê Amedî de akerd. 21'ê menga Adar qandê ma kurdan rojedo pîroz o. O çax şarê ma, nê rojî de vejyayê lewê koyan, adir fistê ci, çorşmeyê kila ê adirê de govent tepiştê. Deyri vajayayê, govendî anci-

yayê. La belê kerdena embaz Mazlumî peyra mahnaya Newrozî jî vurya. Mazlumî qandê tariyinê Zindanê Amed û Cihanî roşnîkerdin slogan "Berkwedan Jiyan" e ya adirê azadî û xoverdayin fist ci ïna kerdena Mazlumî peyra şarê kurd 21'ê menga adar zey roşanê xoverdayin pîroz kerd û iyê kenê. Şarê kurd o nika serniya koyanê berzanê Kurdistanî û heme cayê dînyay de pîroz keno. Yanê o roj bi rojê xoverdayin.

Embaz Mazlumî peyra Ferhat Kurtay hirê embazanê xoya na kil zêdnî. Zekiye Alkan bedenê Amedî sero adir fist xoya û peykereyê ci bajarê Silêmaniye de roniyo. Peyra Rahşan ay peyra Sema Yüce a kila azadî kerd berz, hewna a embaz nîresîbî nîweşxane, xebera Fikri Baygelidî amê.

Komployê 9'ê kewçer û Roma şiyâyinê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî ser, nezdiyê 60 kesan (20 kesan ra vêşî merdi) silogana "Şima nêşenê tîja ma tarî bikirê" ya adir na gandê xoya û mesaj dê dînyay. Kesê ke nê kerdenanê fedayîtiyan pey hesiyenê şâş manenê.

Fedayîyina ma kurdan merşâ netewe-yî (Ey Raqîp) de jî cayê xo girot.

Xortê kurd tev hazîz û amede ne Canfeda ne canfeda, her canfeda

Bi rastî jî ek nê kerdenê fedayîtin nêbê raya azadiyin û serkeftin jî nîna nezdî, be-na derg û derg. Coka lazîm o ke ma pêrin dest ra çiçî yeno bikirê û wastena wayiranê kerdenanê fedayîtin biyarê ca.

KANIYA RES

## Cîrê astî nêwazenê

### ZÜLKÜF KİŞANAK

**A**şîtwazîn kultur a, kultura hezkerdi-na merdimatî ya. Wayirê na kultur, leckerdin û herbkendinî ra qe hez nêkena. Qandê selameteya weşîna xo bo jî, kewtina lecî ra rûmet nêgîna. La belê merdim finê ra nêbeno aşîtwaz. Wexto ke kokî ra û sey seran ra na her ra aşîtwazîn nêbiya kaxûyê, o wext bêguman merdim beno teng û har: Cokra na dewlet, dewleta Tirk nêkewna raya aşî.

Na dewlet roja sıftiyîn ra qiweta xo eskeran ra gîna. Coka jî, weşîna ay de kultura eskeran esas a. Eskerî tim û tim qandê lec û talankerdinî xo perwerde kena. O bêdişmen nêbena. Wexto ke dişmen çinêbo kewna ta û tersî ra bena nîwêş. Goreyê zanayina ïnan dişmenî her tim kewnê rîz û verniya ci birnenê. Jew fin şarê ci û jew fin jî şarê bînî bena

dişmen. Êy rî ferqê dişmenê zerî û teberî çiniyo. Dişmen dişmen o, wexto ke dişmen çinêbo jî o bi xo jew dişmenî xo rî virazeno. Ebi dişmeniya akewno û ebi dişmeniya werzeno. Cîrê ke o esker o.

O ke ganê kesî tewneno çîna wo. Şarê Tirk jî winî yo. Nê serîn peynî de no xulk xeylê bî zelal. Sey seran ra na het ra wo ke, tirk û kurdî pê miyan weşîna xo ravêrnena. Rojîn teng û keray piya raverdnay. Piya embiryânî û merdimî kerdî. Zey di birayan kewtê kalekdî pê. Kurdan na coxrafya da raya weşîna ïnan rî akerd. Û ïna na rindeya kurdan zaf weş zanê jî. Ewrûpa de, Asya de, Afrîka de piya kewtê şeran. Pê kalek de merdî û piya mendî. Faşîstîn tirkan jî nêşenê na bireteya rindikek înkâr kirê. Gelo kurdan roja sıfteyîn re xeta kerd. Wexto ke ma winî vam rind beno? Hewna jî ma vazem vam na xeta niya,

na rindeya kurdan a. Wa kes na rindeya ma ra poşman nêbo.

Çendeyê verê nê rojan, kuçan de şarê ma koteke bêtam werdî. Ebî namê şarê tirkana, ma kurdan wardayînê bêrûmet dî. Zey wahşan ebi çiweyan û lingana kewtî ma ser û dayî ma ro. Televîzyonan û rojnaman de şew û roj moşnay ma. Ma finê ra bîm dişmen û bêrûmet. Na ya bireteya ïnan. Raşt o, jew lec esto. No lec jî qandê bireteya şaran ramnena û heta nika winî ravênd. A bîn jî no lec qandê şoreşê Rojhilata Miyanîawa biyo. Çend ke tirkan ra, eraban ra, asûran ra, almanan ra şoreşgerî estê jî, ci heyf o ke şarê kurd no şoreş de ebi sereyê xoya mendî. Wa gan û zerya çepê nê şaran biveş.

Çimke nê çepan xo bandorê dewletê xo ra nêraynayî. Wexto ke kurdan kuçan de koteke werdî, ïnan se kerdî? Bê çend roşnîkarî, kesî ra qe veng jî nêvejyê. Nê

vatenî heqîqatî yê. Coka jî mayê nê heqîqatan biyarê ziwan.

Weşîn bê bawerîn nêravêrena. Aşîjî bawerîna ma wa. Qandê weşîna vernî û ravêrdina bireteya şaran aşî, hindê nan û awik lazîm o. Mayê hewna zaf bitewê. Aya winî ayseno ke, leco bidomo. La belê ma vam, boka no lec ewro vindero. Qırkerdin û talankerdin gaz dano insaneteya dînyay ro. Çimke kurdî jî şarê na dînyayî wa. Reynayina weşîna şarê kurdan, reynayina weşîna dînyayî yo. Ney ra tepiya dînyaya hemdem nêşena kultura eskeran hewado. Na kultur insaneyî rî zaf giran yena. Eke nîwazanê na giranî bind de bimanî, iyê dekewê raya aşî. Eke ê bi xo nêkewê na ray, no şaro paykewte wo ïnan ebi zora şoreşkerîna dekero raya rast. Na bawerîn ra vêşîrî, rasteka ewro ya. Meşte kurdan biriqyêna.

# *Bi dergeh, ziyaretgeh û perestgehên xwe:*

# Gelo civak dîn dibe!?

**L**i tu devera cîhanê bi qandî welatê kurdan ziyaretgeh û şex tune ne. Ger hebin jî li tu cihî ev qas eleqeyê na'bînin. Li her bajar, navce heta li her gundekî Kurdistanê teqez çend ziyaretgeh hene. Bi tenê li navenda Amedê bi dehan ziyaretgeh hene. Di van salêن dawîn de, hem ziyaret hem dergehê şexan her ku diçe zêdetir eleqeyê dibinîn.

Ger mirov êvareke inê li ber qorziyeke ziyaretgehekê bisekine, bêguman wê rastî dîmenêni wiha bê:

"Hewşa mizgeftekê. Li quncikekî meqberê ji kevirên çekirî yên bazalt honandî... Li hundirê meqberê gorek an jî çend gor. Serê wan bi cawêن kesk ên qedîfe nuxumandî. Berkoleyê bedew ên kevirîn ên serê wan wekî taca padışahan nexşirî. Li ser berkoleyen bi tîpên erekbi nasnava miriyân hatîye kolandin. Dora wan goran bi caxêن hesimî ku bi hostayî hatine çekirin, wekî qefesekê hatîye dorpêçkirin.

## Parsek lotik diavêjin

Li hewşa mizgeftê, li dora meqberê, li ber dêrî yanê li her aliyi parsek... Her yekî, ê cihek zeft kiriye. Parsekên jin, mîr, kal, pîr, zarok; kor, kulek, lal... Belkî jî sap û sax in. Lî xwe li seqetiyê danîne. Destêwan vekirî, çavên wan wekî leyлан li ser mirovên hawirdor e. Di awirêwan de rebeniyeke sexte û kone. Nêrinêni jar ên derewîn û hesûs... Heta ku parsa xwe berhev bikin, wekî benîşt bi mirov ve dizeliqin.

Keçen xama an jî jin; serê wan bi pûşiyên kesk, zer an jî sipî wekî huriyan xêlikirî. Û kalên rihiyêj û şâşikzer. Di destêwan de Yasîn. Wekî parsekan bi mirov ve dizeliqin. "Ji hesret û miraza xwe re, ji ad û wehda xwe re Yasînekê bide xwendin." Yasîn bi pere tê xwendin. Ku pere hindik bin, mirûzîrîs dibin û pere bi paş ve tê ve gerandin. "Ma bi vî pereyî Yasîn qebûl di-be? Wê devê mirov xwar be, çavên mirov



kor bin, a nebûyî bê serê mirov...! Xuya ye," bazareke baş saz bûye.

## Belediye gel dişelîne

Heta li Weyselqiranî (Nehiya Ziyareta Sérte) car sandoqen mezin; dudu li alî jinan dudu jî li alî mîrân devê wan bi kîfîten qirase quflkirî, li hundirê meqberê hatine danîn. Li raserî van sandoqan lewheyek mezin hatîye daleqandin, li ser nivîseke bi tirkî, wiha dibêje: "Pereyênu ku hûnê bavêjin van qumberan wê ji bo paqîkirina hawirdor bêne xerckirin. Walîtiya Sérte." Xuya ye, dewletê jî ji mêj ve ev bazara han kifîs kiriye. Li gorî agahîyen ku em ji şeniyê navçeyê distin, di mehê de bi deh milyaran pere di van sandoqan de kom di-be. Lî, panotek jî ji bo navçeyê an jî perga-la hawirdor nehatîye xerckirin. Rewş kambax a navçeyê û ya hawirdor her tişti bi zelaflî eşkere dike.

Bi dehan, bi sedan, ref bi ref însan bi pi-ranî jin tên tewafkirina van ziyaretan. Li ser rûyê wan ifadeyên melûl, jar, bêçareti, belengazî, nezanî... Gelekên wan nexwes in.

Hinek jê, rûyê wan ji rengê miriyân, rêça dilopek xwînê naxuyê. Teqez, parsekan razî dikin, Yasînan didin xwendin. Xwedê dizane, belkî jî, çend quriş pereyêwan hene, wan jî di riya ziyaretê de xerc dikin. Kesên ku têne ziyaretan ne bi tenê kesên xizan in. Gelek kesên dewlemed jî hene. Ji cil û bergên wan, xeml û xêza wan ev yek dixuye.

Hamî kes bi rézdarî, bi hurmet mexberan ziyaret dikin. Bi pistepist lêvên wan dilebitin. Ji bo ji nexweşîya wan re an jî ji nexweşen wan re "şifa" bê şandin.

Hinek ji wan ev çend sal e zewicîne lê, Xwedê zaroyek nedaye wan. "Xwedê, tu warê me jî şîn kî". Hinek jê, keçen wan ên xama û heta bi qandî madagan in. Lî belê, kesî hîn li derê wan nexistiye. "Ya ziyaret, ya şex tu qismetê wan vekî." Hinek jê; Mîrân wan wekî dalyanan ne û tu kar tune tê de bixebitin. Li mal, mistik arvan nemaye. Lî niha. Niha, zarok heta sibehê ji birçınan dizûzîkin. "Xwedêê!.... deriyekî xérâna vebûya!"

Belê. Rewş wiha ye. Ji mêj ve jî, meyla gelê me ya çûyîna ser ziyaretan an jî, mala Şêxan hebû, lê, ne ewqas û ne wisa. Ji bo bîcîhatîna hesret û mirazîn dilê xwe, ad û wehd dikirin. An jî qurbanek li ser ziyaretekê şerjê dikir, an jî bizînek şerjê dikirin, qeliya wê dibir mala Şêxekî. Lî, li van salêن dawîn ev ci hêwirze ye, ci diqewime? Di gel ku heta niha tu şêxî nexweşek sax nekiriye jî, çima ewqas roj bi roj bêtir dergehê şexan tijî dibin? Ji bajarêni Serhedê rojê bi dehan wesaît tijî dibin û berê xwe didin dergeha Şêxê Menzîlê yê Semsûrê. (Ew şêxê ku heta dawî bi dewletê ve girêdayî ye) Ma destvala çûyin dibe? Ger

mirov destvala here dibe ku ji wê de bi sa-xitî venegere nava zarokên xwe ha! Çîma însan ewqas qefle bi qefle diherin ser goran kesen ku bi salan e çûne ber dilovani ya Xwedê û belkî jî, ew, ji van însanê ne çar bêtir, hêviya rehma Xwedê ne?

Belê çîma?

Îro hişmendiya feodal li nav civaka me hin jî hukmê xwe didomîne. Jêmâyîyen hestêne feodal bi tevayî neşikestine. Gel bi rengekî zanistî sosyalize nebûye û mejîyê gel bi qirêj û gemara sistema kapitalist le-witiye.

Mirovan li gundêni xwe, li zozanen bîlind, li nav çiyayêni asê, di nav xwezayekî paqîj de hewaya temîz tenefûs dikir. Gihe û pincarêni bişîfa û mastê pezên qelew dix-warin. Lî, niha ji ser axa xwe hatîne qutkirin û li keviya bajaran diçilîmisin Xwarina wan keriye nanê tisî ye. Ji be-nezaniyê, bêçare ne û hêviya wan qels e.

Pêrgala tenduristyê riziyaye. Rewş nexweşxaneyan kambax e; ji bo dermanîna nexweşyîn herî sivik jî ne guncan in. Bijişkîn ku li van nexweşxaneyan kar dikin, sonda Hîpokrat ji mêj ve ye ku ji bir-kiriye. Dema nexweşek diçe nexweşxaneyê, bijîşk pêşî karta navnîşana kargeh xwe ya arizî dide nexweş. Kî diwêre ji ec-zaneyan pirsa bîhayê dermanan bike!

Di derûniya gelên bindest de kompleksa xwe biçûk dîtinê heye. Mirovên ne xwe di ideoloji sergêj in, reben in û xwe bêhêrî dibinîn. Di binhişîna xwe de perestgehan ava dikin, da ku xwe bispêrin wan. Di wê dînyaya xwe ya xeyali ku wan bi xwe ava kirine de, bi alîkariya wan hêzan! li edaletî digerin û bi vî rengî hestêne xwe têr dikin.

Civaka me digel hemû bager û bahzan, feqîrî û xizaniyan jî ber bi roniya aza-diye ve dimeşe.

Lê bes, alîyekî civakê jî va ye, ev e. Ger ne xelet bim alîyekî civakê jî dîn! dibe.

ROŞAN LEZGİN



Li van salêن dawîn ev ci hêwirze ye, ci diqewime? Di gel ku heta niha tu şêxî nexweşek sax nekiriye jî, çima ewqas roj bi roj bêtir dergehê şexan tijî dibin? Ji bajarêni Serhedê rojê bi dehan wesaît tijî dibin û berê xwe didin dergeha Şêxê Menzîlê yê Semsûrê. Ma destvala çûyin dibe?